**MİZAMPAJA İLİŞKİN NOT:**

**Ön Kapak:** *Sema Yüce arkadaşın fotoğrafı*

**Arka Kapak:** *Ortada Sema arkadaş, sağında ve solunda Fikri Baygeldi ile Hukmiye Seyhan arkadaşların fotoğrafları olacak.*

***Selamlar...***

# KEÇA AGİRÎ

**Demhat Hezexî**

*Ez vê pirtûka çîrokan, diyariyê şehîd Sema Yuce û Fikrî Baygeldî dikim û di kesayetiya wan de diyariyê Partiya Jina Azad(PJA) dikim...*

## Pêşgotin

Ez bawirim ku di nava malbata mirovahiyê de gelê herî dewlemend, ji aliyê wêje û huner ve gelê Kurd e. Ji ber ku her bûyerek li ser axa vî gelî, mijara stran, helbest, çîrok û romanê ye. Lê mixabin ku heta niha jî dagirker û mêtînger, wekî ewrên reş û tarî seranserê asîmanên axa ku bûye dayîka şaristaniyê tawanên mirovahiyê pêk tînin. Civak, erdnîgerî û xwezaya welatê çavkaniya dîrokê, bi zincîrên zingarî hatine zincîrkirin. Hest, giyan û mêjiyê bi milyonan mirovî kiribûn nava zindanek kirêt. Hênaseyên jiyanê dîl hatibûn girtin. Çand, ziman û sinca gel çiqas diçû di nav heriyê de noq dibûn! Lê piştî ku Têkoşîna Rizgariya Gel a di bin Serokatiya Serok APO de bû “Roj”, di singa tariyê de jiyan ji nû ve û bi şêweyek zanistî afirî! Bi têkoşîna salan re, êdî wêje û hunera Kurd hêdî hêdî xwe derxist û derdixe ser dika wêjeya cîhanê. Bêguman, di vê pêşketinê de rista jina Kurd girîng e. Çawa ku jina Kurd çanda sedsalan parast, îro jî di pir waran de pêşengtiyê dike.

Îro jî li ser bingeha afirandina wêjeyê, çiyayên welatê Kurdan bûne dibistan. Pir berhem bi pênûsek xwerû û zelal tên nivîsandin. Nivîskar Demhat Hezexî jî yek ji wan hevalên ku pênûsa xwe ji bo wêjeya Kurdî kiriye bin fermana pêşketina vê şaxa girîng e. Heta niha du pirtûkên nivîskar Demhat Hezexî ( ji bilî gotar û nivîsên cur bi cur) hatin weşandin. Ya ewil a bi navê “Ew

Şehîdên Mezopotamiyane" û a duyemîn jî "Rêjne" ye. Ev pirtûka sêyemîn jî ya çîrokan e. Lê, xala balkêş ew e ku hemû çîrokên wî li ser jina Kurd e. Her çîrok rastiya jina Kurd a di nava têkoşîna azadiyê de tîne ziman. Lehengî, berxwedanî û daxwaza nûbûnê û vegera gewhera xwe a jina Kurd, bi awayekî pir vekirî radixe ber çavan.

Di van çîrakan de baş tê dîtin ku jina Kurd bi çi ked, hewldan, lêgerîn û şerê li dijî kevneperestiyê dixwaze bi azadiyê re bibe yek. Ez vê xebata Nivîskar Demhat Hezexî pîroz dikim û hêviya min ew e ku berhemên wî yên bi vê armancê berdewam bikin.

**Hunermend Xebat Dêrîk**
**Dibistana Şehîd**
**Sefkan a Çand û Huner**

**Destpêk**

Berî her tiştî ji bo xilasbûna vê xebatê ez gelekî kêyfxweşim. Ji ber ku hêj ji mêj de min dixwest xebateke wisa li ser jinê binivîsim. Bi taybetî ji bo bîranîna hevala Sema, hevala Hukmiye Seyhan û hevalê Fikrî Baygeldî vê xebatê girîng dibînim. Bê şik, bawerim min mafê wan nedayê, lê dîsa jî nivîsandina vê pirtûkê pêwîst bû. Lewre, min tim xwe deyndarê wan didît û hîn jî xwe wisa dibînim. Lê, wekî min di nivîsarên din de jî anîbû ziman, yê karê nivîsandina li ser wan û şehîdan berdewam bike. Ji derî van gotinan naxwazim hevokên dirêj bikim. Tenê, ez li benda rexneyên xwendevanan im.

***Hevala Min***

*Keça Agirî,*
*Min navê te*
*Bi mîxê ko*
*Li ser dilê xwe kola.*
*Stêrkek ji hesin tomar kir,*
*Bi agirê evîna te sor kir,*
*Li dora navpîroziya te.*
*Kir perwaz, hevala min...*

**KEÇA AGIRÎ**

Agirî, çiyayê bilind, çiyayê bûyî warê volqanan, Araratê bûyî şahidê avakirina zemînê cîhan û cîhana mirovatiyê, bihemû heybeta xwe ve li herêma Serhatê temeşe dikir. Çiyayê Cûdî jî, rawestgeha keştiya Nebî Nûh, ciyê miradan, hêlîna tayrên baz û lawirên curbecur bûbû taca serê Botan. Û tevahiya çiyayên vê erda zêr, mîna xelekên zincîrê bi hev ve girêdayî bûn, nîşana yekîtiya erdnîgeriyê didan diyarkirin . Û şahî, şadî û jiyan ji her bostek axê serî rakiribû. Lewre, dinya bûbû bihar li welatê her du çeman. Çiya û deşt xemilî bûn ji kulilik û Sosinan. Ax, ji bêhna misk û embera siruştî diforiye. Ji xwe zozanên Feraşîn di nav gul, beybûn, kulilîlk û cokên avan de, noq bûbû. Ew avên zelal jî, di wan cokên piçûk û teng re diherikîn. Çem û rûbar bicoş diherikîn. Ba jî, ketibû tevgerê, lê nikarî bû bibe heval ji dengê çivîkên ku bi biharê şadibûn. Şêneyên Mezra Botan zindî bûbûn. Lê, dîlên şerê azadiyê ji gulbihara bihuştî bêpar bûn...

Nû ji xew şiyar bû û ji cihrazana xwe ya li ber şibakê, li çiyayê ku di navbera hesinan re xwiya dikir, nerî. Bi nerînê re dilê wê bû şadî û kenî û ken li ser rûyê reng genimî bû wêneya hêviyê û di nava dilê çiyan de bû sûlav (şelale) û av, ava jiyanê herikî. Ew jî bû tayrikeka rengşêrîn li ber kevîka wê avê û nikilê xwe li avê dixist dîla şerê azadiyê... Li ber şibakê xwe rast kir û bi çarmêrgî rûnişt. Di hemen katê de, tîrêjên rojê ciyê xwe li ser rûkê wê girtin û baram dileyistin. Lê, piştî çend xuleyan bû siware hespê ku biçargavî di nav xeyalan de dilezand. Berê hespê rawan kete ser riya gundek ji gundên bajarê Agirî. Êdî çaxê zarokatiyê diaxifî. Çiyayê Agirî û bihara Serhatê li ber çava bû. hate bîra wê gava bihar dihat, gul dida hev, pritîgurzek gul di nav destan de çêdibû, bilez û bez diçû ser gora bapîrê xwe, gulên renga reng li ser gorê rêzdikir. Û bi demhejmaran li cam kêlên gorê rûdinişt. Li her rûniştinekê, li çiyayê Agirî kûr kûr dinerî. Li vîr xwe jibîr dikir, ewqasî xwe jibîr dikir dayika wê dihat, dikir gazî;

"Keça min, berxika min bû êvar,were mal. "

hingê divinciniqî û şiyar dibû. Dîsa vegerî girtîgeha kembax û got;

"Bapîro, nikarim te ji bî bikim. Ew hevokên ku bavê min li ser jiyana te ya serhildanê ji min re digot, ji hişê min dernakevin. Lewre, cara ji xwe pirs dikim, gelo rastiya min di gora te de, di navê Leyla Qasim de û di çiyayê Agirî de ye? Tu zanê bapîro, ez niha li hespê rawan siwarim û bêrawestan li rastiya xwe digerim. Lê, di encama hemû gerên xwe ên dijwar de, li cem Serok APO disekinim! "

Bi gotina Serok APO re her du lêvên wê ji ser hev rabûn û kenê wê bû roniyek geş. Canê wê tev zindî bû, her deverê wê kete nava tevgerê. Û çav, ew çavên bedew di nava fincana xwe de direqisîn. Lê vêcarê axifî, gotin mîna libên tizbiyan li pey hev rêz bûn;

" Serokê min, serokê bûyî rastiya azadî û rizgariya ji tariyê; niha demsal bihare, heval şiyar bûne, pêkeniyan dikin, stranan dibêjin, bablekan dileyizin... Lê, em ? Di navbera çar dîwarê mirî, şibake hesin û deriyê vê dojeha stûr de ne. Dûmana karistanan em di nav teniyê de hiştine. Lê, çi dibe bila bibe; bivîna aza, bimejî û hestên şoreşgerî ku em ji felsefa te ya jina azad girtî, em ê di hundirê xwe de biharê vejînin! Ango, yê kesatiya me bibe bihar û bi bihara welat re bibe yek!"

## 2

Birûkenî ji cihrazanê daket xwar. Li derdora xwe nerî; du- sê hevalên wê di xeweke girande bûn. Yek ji wan cilika xwe ya nixmandinê ketibû erdê. Bigavên hêdî ber bicilikê ve meşî, rahiştiyê û dîsa bi ser canê hevala xwe de kir, lêvên xwe qermiçand û got;

" Çima wisa dikin, çima guhdar nakin? Nizanim ev bû çend car ez wan şiyar dikim, lê her weke xwe dikin. Hêjî, hin heval tênegihiştine ku ew neyê xwe ne, ew malê partiyê ne, malê gelin. Pêwiste heval xwe baş binixmînin, lê dinya baş germ nebûye, lê yê nexweş bikevin. Ger mirev kete davika bayê sar û bê navnîşan, negengaze ku nexweşî rû nede. Nexweşiya bayê xapînok mirev diêşîne. "

Serê xwe hejand û ji wir dervazî aliyê serşokê bû. Li ber destşokê rawestiye, çavê xwe şoşt û li neynika dîwarî temeşe kir, li xwe û rengê xwe temeşe kir. Bi temeşekirinê re, hişê wê dîsa bû zimanê ponihandinê û got;

“ Çima vê nexweşiyê ez bernedam? Ewqas sal min dibistan xwend û heta salên ku min beşa felsefê dixwend jî, nayê bîra min ez nexweş ketim. Nizanim ev nexweşiya zerikê ji kû hat û kete nava canê min? Lê, berê min sozdabû serokê xwe û fermandara xwe Zîlan, ez tucarî nexweşiya xwe nekim asteng pêşiya kar û jiyana xwe ya şoreşgerî. A herî girîng divê kesatiya jina azad di gewhera xwe de pêk bînim. Neynika ku min nîşanî min dike; hevala Zîlan textê evînê, textê rastiya jina azad, vîn û bawerî di hiş û dilê min de çêkir. Û vaye, ew tim bi min re jiyan dike, ezê çawa çavê xwe ji kêmasî û çewtiyên li dijî xeta Serok APO re bigrim? Na, ez çavê xwe nagrim û destûr nadim. Lewre, azadî ew e! Hevala min Zîlan, ev bû demeke dirêj pêjindikim ku giyana min di nava livbaziya te de tê şoştin. Û naxwazim ji nav vê ava pîroz derkevim. Ji ber ku her piyanek ji ava te vedixwim û bi ser carê xwe de dikim, şanên min yek bi yek zindî dibin û xwîn, çûn û hatina xwîna rayên min bêkelem dibe navê jiyanê!...”

ji wir jî, dakete kata jêr. Êdî xwe pir sivik didît, qet binexweşiya xwe nediramî, bêrawestan li eywanê dimeşî. Lê, cara jî, desekinî û li wêneyê Serok û Zîlan dinerî û pê re pê re dibeşişî. Di wê beşişandinê de, mirev digot qey; pêjindike ku li ber deriyê cîhaneke bêguneh sekiniye û biderî girtiye û dixwaze derbasî hundir bibe. Û cara jî, tenê çavê wê zîq diçû ser wêneyê hevala Zîlan û ji xwe re digot;

“Hevala min a pîroz, ez giham wê baweriyê ku tu ji çiyayê Hîmalaya bihêztir û bilindtirî!... Te ne tenê jina Kurd, herweha kevneperestiya jina Rojhilata Navîn parşekir û te ew ji zincîra zilamê mijokdar û serdest rizgar kir. Û te di nava tariyeke zilumat de xwe kir ronahî, ronahiyeke ku her jin li ber rastiya xwe bibîne!”

Bi van gotinan re, coşeke bilind wergirt û di nava vê coşê de hêz xwiyadikir. Û mirûzê wê, bû mîna geşguleka biharê. Lê, dîsa got;

“Xwedaye evînê Zîlan; canê min, erê canê min, her deverê min bûne tevzînok û bandora te ya bêhempa ez dorpêçkirime. Û mîna pirpirîka pir reng dixwazim di nava asoyên azadiyê de fir bidim. Dixwazim werim cem te û serê xwe dayinim ser kemaxa te da tu çêl mirovê pîroz bikî û ez bibim hevala te!”

ji nişka ve dengek hat guhê wê;

“Hevala Sema, rojbaş”

“Rojbaş, hevala min ”

“Cejna te pîroz be”

“Ya te jî, ya hemû gelê Kurd û şehîdên Newrozê pîroz be.”

“Heval, peyama te ya boneya pîrozbahiya cejna Newrozê nivîsî bû, me ji hevalên xorta re şand”

“ Başe heval, ew ê îro Newrozê pîroz bikin, em jî sibe. Lewre, pêşniyara me kirî ku hevalên jin sibe Newrozê pîroz bikin, hate pejrandin. Ji bona zû şandina peyamê, we pir baş kir.”

Dîsa ma bi tenê, lê, di kurtedemekê de rengê wê qulipî . Rengê nû ku kursiyê xwe li ser rûkê wê çêkiribû, pir cihê bû û tê de , ango li ser kûrbûneke nirxgiran zelal dihate dîtin. Û hişmalika wê di nawa vê kûrbûnê de bû dengek û olan da !”

“Agir! Agirê pîroz! Naskirina raza agir!... Belê agir, agirê jîn afirandî, ez dîl girtime. Lê, baş bizane, min tu naskirî û nedûr, lê nêzîk ezê werim û bi te re bibim yek. Ji ber ku min hunera te ya govendê naskir û dizanim tu çawa mirovan ji gunehan dişo...”

Sekinî çavê xwe li dîwaran gerand; dîwarên odê ji wêneyên Serok, Zîlan, Mezlûm, şehîdên Newrozê û ên 14 ê Tîrmehê hatibûn xemlandin. Li ser televezyonê jî, wêneyek serok û hevala Zîlan hebû. Ber wan ve çû. Rahişte wêneyê serok, ramûsand û got;

“Rok! Roka pîroz, roka çavkaniya jiyanê!... Tu bingeha jiyanê yî, lewre, te jiyan afirand û jiyan li ser te teşe û naverok girt. Îro jî, tu agirê bo xweza û mirovatiyê yî. Pêwiste agirê te venemre û bêparastin. Lê, hin kes û derdor dixwazin xwe bikin asteng li ber ronahiya te ya ku ax û cîhana mirovatiyê ronî dike. Dixwazin te rakin û li şûna te rûnin. Lê, divê zanibin çawa du roj nabin di jiyanê de jî, du serok nabin. Lê, em zarokên rojê, destûr nadin ku kes nêzî rojê bibe. Bila her kes bibhîze, em parêzvanê serokê xwe ne!...”

“Hevala Sema, hevala Sema ”

Bi gazî kirinê re, hişmalika wê rawestî. Axaftin û ponijandina cîhana wê nîvrê ma. Wêne di dest de, li hevala xwe nerî, bişişî û got;

“Fermo, hevriya Sema ”

“Hevalan berî bernameya fireh ya ku yê sibe were pêşkêşkirin, bernameyek piçûk amadekirine û yê niha destpêbike”

“Nexwe em herin, hê heval zivir nebûyîn”

**3**

Sema li pêşiya dika ku hevalên wê ji maseyan tomar kiribûn, rûnişt. Tev bimoral bûn, şox û şeng di rûyên wan de xwiyadikir. Lê, Sema ji tevan cuda bû. ji ber ku jilyanê ki ser bejin û bala wê ciyê xwe girti bû. Û mirov li hinarkên rûyê wê dinerî, te digot qey xweşî tev li ser  wan civiyane, ewqasî mîna kulilikên sor bedew bûbûn, narîn bûbûn. Ji xwe herkandina ken qet ji lêvan qut nedibû. Û ew ken dibû tekûzkirina şahiyê. Lê, di cî de ew ken çû û di her du çavên wê de şewq veda û rû bû cewek sipî. Dûre cewê sipî xwe gihand mejî û raman bû pênûs. Pênûs jî, bihebra rengzêrîn cew neqişkir. Û ew cew bû rûpelek ji dîroka derbasbûyî û Sema bibal ev rûpel xwend. Ew dîrok, mêjûya şehîdên Newrozê bû.Û êdî dika li ber çavê wê, bû qada livbaziyên agir!... di nava heyecanek zarokatî de got;

“Ez we dibînim, aha va hûn û agir govendê dikin. Zekiye, Rahşan, Mîrza, Ronahî û Bêrîvan bidestê hev girtine, dirûşmeyan diavêjin. Li benda min bin, govendê belav nekin, va ez jî, têm...”

“Hevalno, em agir vêxin.”

Û ew deng werîsê xeyalê Sema qetand û berê wê kete wî dengî û deng dîsa bilind bû!

“Êdî dema agire, dema dîlanê ye”

Dinya bûbû êvar, bayê biharê li hewşa zîndanê dileyîst û xwe li agirê Newrozê dixist. Her ku ba li agir diket, agir gur dibû, geş dibû û mîna çawa ba xwe li pora zeriyekê bixe û bileyîzîne, wisa agir dida ber pêlan, di nava pêlên xwe de dileyîst. Êdî agirê Newrozê di nava şahiya xwe de direqisî. Sembola ronahî û azadiyê, hêza qetandina tariyê bûbû vîn û şerekî erjeng li dijî veşartinê li dardixist. Govenda dîlên şerê azadiyê ên jinan jî, li dora agir digeriye. Sema serê govendê girtibû û di destê wê de destmala sê rengê ala netewî dihejî. Gih qîr dikir stranan, gih jî, çavê wê zîq diçû ser agir. Lê, govend bidawî bû û dengê çepikan ji zîndanê bilind bû.Zebaniyên dojehê leşkerên roma reş, ji wî dengê biheybet guhên xwe girtin û mirûzê xwe tirşkirin. Lê, deng û agir bûbûn heval û mîna du evîndaran hev hembêz kiribûn. Girtiyên azadiyê jî, yek bi yek xwe ser agir re diqevaztin. Sema jî, li wir, nêzî wê kir û got;

“Hevala Sema, ka ez û tijî bi destê hev bigrin û xwe ser êgir re biqevêzin”

“Li min bibore hevalê, ez nikarim”

Heta demeke şevê şiyar man. Stran û helbestên dihatin ziman jî, ketibûn pêşbirkê bi demhejmarên şevê re. Eywan, stran û civat bûbûn yek. Piştî çend stranan, çavê tevan qulipî ser Sema. Yek ji hevalên wê got;

“Ger hevala Sema bipejirîne, ez ser navê hemû hevalan stranekê ji te dixwazin”

Li ser vê daxwazê Sema kenî, civat jî tevlî kenê wê bûn û Sema bi zimanekî zelal got;

“Hevalno, hûn tev dizanin ez pir ji dengê hunermendê mezin û nemir M. Şêxo hezdikim û bitaybetî strana wî ya bi navê ey lê gulê li ber dilê min pir şêrîne. Ez ê îşev jî, ey lê gulê ji we re bistirînim ”

Gava Sema qîr kir strana ey lê gulê, her kesê dendik ji destê xwe danî, henasên xwe girtin, bêdengî kete nava wan, kes bi hev re nediaxifî û bibal guhdarî dengê wê dikirin;

“Ey lê gulê gula minê, şêrîna li ber dilê minê, gulê nadim malê dinê, ez li ser gulê têm kuştinê...”

Û dengê wê yê zelal û xweş civat kiribû dilê xwe. Mirov digot qey bilbila daristana di nava wan de dike fîgan, ewqasî dengê wê yê zelal bûbû keman di guhê wan de. Piştî stran qedî, nêzîkî deh çirkan dengê çepikan li ser dika şevê ma. Êdî dem jî, bûbû dereng. Şev jî, şeva şahiyê bidawî bû. Li pey hev, yek bi yek berê xwe dan xewê. Lê, hinan ji wan digot;

“Şahiya mezin sibeye”

Hevalên Sema diçûn kata jor, ciyê cihrazanê, da rakevin, lê, bê ku bizanin yê piştî çend

demhejmaran bûyereke dîrokî rû bide...

**4**

Eywan ma bêdeng, lê dengê lingê wê ew bêdengî û serdestiya bêdengiyê xira dikir. Her çiqas dengê pêlavê nimiz jî, bû, dîsa jî, nedihişt bêdengî zîndanekî di nava zîndanekî de ava bike. Lê, ev çûn û hatina wê nemîna meşên li hewşa zîndanê dikir. Na, di nava vê meşê de ponijandina sal û mehan diyar dibû. Mejî, hest, giyan di navenda felsefeya mirovê pîroz de bûbû yek. Rêyezên jina azad xwe berdabûn nava xwîn û kesatiya wê. Êdî hemû aliyên wê bûbûn yek bipêşerojê re. Çarekê sekinî, serê xwe bilind kir û got;

"Fermandara min Zîlan, va ez dimeşim di nava rastiya jina azade. Û gav bi gav ber bi tev e têm. Ez bawerim, min pra siratê dervaz kir. Niha li ber derî me, hindik maye te bi hemû xisdetên azadiyê hembêz bikim!"

Du gav ber masê ve avêt, rahişt kovara Gelê Azad(Özgür Halk) û li ser kursî rûnişt. Çend rûpel jê qulipand û dest bixwendina nivîsnirxandina serok ya li ser Zîlan kir. Bixwendinê re, awirên wê tûj dibûn, mirûzê wê hişk dibû û ji çawa çirûsk vedida. Gava xwendin qedand, kenî. Dem jî, berbeyaniyê ve diçû. Hingê, rabû ser lingan û got;

"Hevala min Zîlan, ez dizanim niha tu tayreka rengsipî yî di nava bihuşta jiyana rasteqîn de, di nava asoyên azad e firdide... Heval; dû te re, hevala Bermal û hevala Leyla hatin. Niha ew jî, li cem te ne. 'Min jî, pir dixwest livbaziyek wek a te pêk bînim, lê derfet...' Lê, çi dibe bila bibe şoreşger ew e ku di nava bêderfetiyê de derfetan diafirîn e! Va ez jî, têm da bi roka pîroz re bibim yek!"

Bi gavên hêdî, lê bi vîn, bibawerî, bihêviyek xurt û dîtina pêşerojê meşî. Mîna xwedaya evînê sekinî. Li ciyê livbaziyê jî, kenî. Gava destê wê dirêjî bîdonê kolonyayê bû, mîna destê xwe bavêje baqek gul kenê wê zêde bû. Û bîdon bi ser canê xwe de vale kir. Û agir, agirê Zerdeşt, agirê ku mirovan ji hemû gunehan dişo, bicanê wê geş bû. Ew agir bûne yek, bi hev re govend girtin, govend çiqas diçû geş dibû û dengê wê yê bilbilî bigotina strana ey lê gulê bilind dibû. Belê, belê ew govend bû, govenda azadiyê bû, govenda li dora rojê bûyî xelek, bû. Qet nedigot ax, qîr nedikir, tenê dengê;

" Bijî Serok APO, bijî Newroz, bijî hevala Zîlan"

ji nava govendê bilind dibû. Bi deng re, tevgerek lezgîn kete nava hevalên Sema. Tev ji xew şiyarbûn û ber bi ciyê livbaziyê ve bezîn. Bilez agirê wê vemirandin. Lê, Sema xemgîn bû. Li hevalên xwe nerî û got;

"We çima agirê min vemirand, ew agirê min bû!?"

Ew bilez rakirin nexweşxanê. Pêsîr û rûyê wê tev şewitîbû. Li nexweşxanê, bijîşk lê kom bûn...

**5**

Li ser cihrazanê dirêj kirîbû û derên wê yê şewitî, tev bi cewê sipî pêçayîbû. Nedipeyivî, lê dil û hişê wê diaxifîn. Hemû raman û hestê wê li cem Serok APO bûn. Xewn û xeyalên Wê li cem Zîlan bû. Û bi Serok re diaxifî;

"Serokê min, ez bo hemû peywiran amade me. Wek jineke azad, hindik be jî, dixwazim barê te rakim, bibim hevala barê te. Dixwazim felsefeya te ya jinê, dervazî jiyanê bikim. Ez pêjin dikim ku ez ê karibim bar hilgirim û li hemberî hemû riyên serdestiya zilam şer bikim û azadiyê bi wan re par bikim. Lewre, dixwazim hevaltiya sosyalîst di hundirê zilamde, bi pêşengiya îdeolojiya te

ava bikim.”

Û cara jî, bi Zîlan re dimeşî û diaxifî;

“Zîlana pir mezin, birastî min ewqas nizanîbû azadî xweşe. Lê, piştî livbaziya te û niha ez dibêm; ger her jinek û zilamek raza pîroziya azadiyê fêr bibe û tê de têgihiştiba û xwe ji hemû kirêtan şoştibana, yê ref bi ref tevlî jiyana azad bibane û yê jiyaneke wekhevî, aşitî, biratî li ser rûyê ewdê avabikrane. Lê, hevala min; jan, birîn û şerekî kesayetî ji vê riyê re pêwiste. Ji xwe wek tu jî, dizane, di dawî de tarî bar dike û ronahî dibe serdest. Ronahî jî, bihara herî xweş e.”

Rojên wê wisa dagirtî biraman û ponijandin derbas dibûn. Lê, cara jî, digot;

“ Ger ez rabim ser lingan, ez ê ji hemû aliyan ve jiyanê hembêz bikim. Yê jiyana partiyê, Serok û Zîlan bo min bingeh be. Ez ê mejî û giyana xwe tev bo afirandinê bikim tevgerê. Ji ber ku min rastî naskir û divê rastî riya min be. ji aliyê din ve pêwiste mirovê şoreşger nûnertiya xeta xwe di jiyanê de jî, pêk bîne!...”

Sema tim li ser van pêpelûkên jiyana jor ve hildikşî hata bilind. Lê, gava bihîşt Fikrî Baygeldî bi çend rojan şûnde liser şopa wê livbazî pêk aniye, hingê dest avêt pênûsê û namek nivîsî;

“Hevalên hêja ; Livbaziya hevalê Fikrî pîroz e. Şehîdbûna wî lehengî û qehremaniye. Di wê pêngava wî de;evîna rast, hezkirin û hevaltiya azad ya bi jinê re ye. Wî zilamê kevin di kesatiya xwe de kuşt û bû nûnerê ciwanên azad. Pêwiste em xwe li ber bejna wî bitewînin. Ji ber ku her mirev nikare xwe di nav xweşikbûna felsefeya jina azad e bişo. Ji ber ku her qutkirina rayê kevin û vale kirina xwîna bêhn pêketî nehêsane. Tenê mirevê xwe azad dike û bimirovê pîroz re dibe yek, dikare bibe heval ji jina azad re. ”

Û rojên wê di nava têkoşîneke bêhempa de diborîn. Bijîşkan careke din xwe dane hev bo rewşa wê. Lê, vêcarê di çavên wan de lawirên hov xwiya dikirin. Mirovatî ji rûyên wan barkiribû. Sinc (ahlaq), xisletên însanî, soza bijîşktiyê li bazara dolaran hatibû firotin. Qaşo, gotin;

“Ew baş bûye, pêwiste em berdevika oksîcênê li ber devê wê rakin. ”

Xwiya bû biryara kuştinê hatibû girtin. Leşker û bijîşk bûbûn yek. Û berdevik rakirin. Lê, piştî kurtedemekê keça Agirî, bievînek mezin berê xwe da çiyayê Agirî. Xatir xwest û çû...Ew û bapîrê xwe li cem hevin. Û çiyayê Agirî li hemberî hemû astengan keça xwe diparêze.

*Ji bo bîranîna hevala Sema Yuce.*

*Her pakrawanek*
*Bihareke*
*Li ser axa dayê!...*

**ŞERVAN**

Zîndan nêzîkî behrê bû. Gava behr dîn û har dibû, rêwîtiya li ser behrê ya bi riya keştiyên mezin û piçûk kêm dibû. Pêl diketin pêşbirkê û cara tu pêlan guh nedidan hev, bêserî li xwe dixistin û av bilind dikirin. Û ba radibû. Bayê ku ji hêla behrê bilind dibû jî, mîna pêlê deryayê bi ser zîndanê de dihat. Cara ba ewqas bihêz bû, hûr û mûrên girtiyan li hewşa zîndanê bilind dikir û li dîwarên hewşê dixist. Cara jî, kincên girtiyan bi xwe re dibir.

Deriyê hewşê vekir, bayek hênik dihat. Ew bayê bêserî rawestiya bû. Dem, gav bi gav ber êvarê ve diçû. Fikrî destê xwe da kincan, kinc ziwa bûbûn. Ew bixwe, ew sê meh bûn prywira paqijiyê hilda bû ser milê xwe û nemaze ew çend roj bûn bi erka xwe ve wekî goşt û hestî hatibû girêdan. Fikrî, dest bidane hevdana kincan kir û got;

“Hevalno, kinc ziwabûne, bila heval kincên xwe ser benan rakin, hevalê niha yê gogê bileyizin.”

Li ber kevîka şibakê rûnişt, çixareke Maltepe ji bêrîka xwe derxist, pêxist hilmeke kûr jê kişand, dûmana çixarê çep û rast belav bû. Lê, ponijandina wî qet belav nedibû. Mirov, di tevgera çav, birû, lêv û mirûzê wî de derdixist ew ne li wir bû. Ewqas diramiya, te digot qey xwe berdaye binê deryaya kûr û ketiye ser riya lêgerîna bidestxistina hin encaman. Carekê çavê xwe girt û got;

“Pêxemberê me Zerdeşt çi gotibû? ‘Rast bifikir, rast bêje û rast pêk bîne..’ Erê hevala Sema, te ev her sê rêgez pêkanî. Têgotin; ‘pêdivî maka afirandinê ye’ Te jî, ji ber pêdiviyekê livbaziyeke mezin afirand! Te da ser şopa hevala Zîlan. Te di wextê xwe de, xwe kir xeleka agir li dora Serok da tu wî biparêze... Û te navê xwe di pirtûka  jina azad e nivîsî. ”

Rabû ser lingan, li hevalên xwe yên gogê dileyistin nerî. Hin hevalên wî ên din, li leyistika gogê temeşe dikir, hin din jî, pirtûk dixwendin Û telefezyona MED temeşe dikirin. Çixara xilasbûyî avêt, çixareke din vêxist û got;

“Jiyan mîna çemekî diherike, em însan jî, di nava vê jiyanê de tenê dilopê avêne. Jiyan deme û nayê rawestandin. Lê, ya girîng ew e ku mirov karibe bi demêre bibe heval Û pê re bimeşe. Meşa bi demê re serketineke mezin e! Fermandara min, te cîhaneke nû di giyana min de avakir! Te guhartin û veguhartineke xurt di hestê min de pêkanî. Hevala min, berê ez newisa bûm. Ez mirovekî cusa bûm û di nava cîhaneke reş de bûm. Berê min jin piçûk didît, bêhêz bêvîn, bêçare û qels didît. Tenê min biçavê ku her jinek li ser riya zewaciye û kebaniya mala xwe ye., dinerî. Lê, niha jin, evîna jinê, rastiya azadiya jinê di hişê min de mezin e û li ber ked û têkoşîna wê radiwestim wekî leşkerekî! Êdî, ez giham wê baweriyê ku yê jina Kurd xwe azad bike, bibe pêşeng ji azadiyê re û bibe nimûne ji jinên cîhanê re. Û giham vê encamê azadiya zilam di azadiya jinê re dervaz dibe. Dê rojek bê, pirtûka dîrokê vê rastiyê bîne ziman. Hevala min Sema dîsa dixwazim bêjim, ez newisa bûm. Lê, agirê te yê pîroz bûye xelek xelek li dora min û navde roj bi roj bû dibim, kirêtên min tên şoştin!”

Çixara xwe vemirand, dervazî hundir bû. Notirvanê rojê ş^İv amade dikirin. Fikrî jî, alîkariya wan kir. Tevger, libata wî ya zindî bû sedemê mijara gotûbêjên hevalên wî. Her yekî ji wan tiştek digot;

“Rewşeke vî hevalî heye, berê newisa bû.”

“Bala min jî, kişand. Tu dibe qey Fikrî yek çûye yekî din hatiye.”

“Gelo, wî û hin hevalan nîqaş kiriye, anjî, hemal ne ew zivir kiriye?”

“Nîqaşên çi? Heval ka baş li rûyê wî binêr, weleh wekî guleke geşe, ewqas rûyê wî geş xwiya dike. ”

“Ez bixwe dibêm bandora heval Sema, pir ew guhartiye. ”

“Ev çend rojin, alikariyê dide hemû hevalan, tenê kêm maye xwe bike pir bo hevalan!”

Fikrî, xwarin li ser masan rêz kir û tev hevalên xwe rûnişt, dest bixwarin xwarinê kir. Kenê rûyê wî jî , tim heval bû. Bihevalên xwe re dikenî û ew dikenandin. Ji nîşkare li hevalên xwe nerî, du- sê parî xwar û xwarina xwe ya mayî, da du hevalan. Yek ji wan Laz bû û yê din Tirk bû. Mirov digot qey bi vê parkirinê, dixwest yekîtiya gelan bide diyarkirin û bala wan bikşîne ser vê xalê. Gava bi kevçî xwarin valekir sênîkê wan qet ken ji ser rûyê wî winda nebû. Di ken û tevgea w^İde xatir xwestin dihate dîtin. Li katejmara xwe nerî; dema nûçeyên êvarê nêzîk dibû. Heme cîde rabû ser xwe, berê xwe da pêpelûkan, bilez û bez hilkişî katê sisiyan. Di hişê wî de agiri têgîna agir rûniştibû û dixwest zûtirîn katê de agir hembêz bike. Di cî de sekinî û rûpelek ji amadekirina livbaziyê qulipand, got;

“Min name nivîsandin, du bîdonê mezin ê koloniya bêdestûr, ji dizî ve anî. Niha jî, divê ez lez bikim û bighim hedefa xwe.Pêwiste bighim hedefê, hedef...”

Gava giha kate sisiyan (ev kat, mezelek mezin û fireh lê hebû , lê, dewletê girtibû. Tenê li ber derî eywaneke piçûk hebû. Girtiyan jî, rojname û kovarên kevin li vir dihiltanîn. Li eywanê deriyek din hebû û ew derî yê eywanê bû. Her weha beşa daşîrê jî, li ser eywanê hebû. ) û bilez deriyê hesinî yê eywanê girt. Bilez kincên xwe ji xwe danî, tenê gore di lingan de ma . Kincên xwe danî ser masê, wêneyê serok danî ser kinca xwe, li dora wêne sê terîşên jî rengê ala rengîn rêz kir. Li ber wêne rawestiye û got;

“Serokê min, êdî ez baş dizanim ku tu; zanyari, fîlozofî, civaknasî, bijîşkê mirovanî, serokî û senteza hemû pêxember û Serokanî. Îro, yê herî baş mirovan nas dike û nexweşiyên wan derman dike tu yî. Piştî te bila kes nebêje ez serokim, bila nebêje ez civakê, xwezayê, mirovan nas dikim û

pêşerojê dibînim. Lewre, ez têm dadgeha te û ji bo kêmasî û şaşitiyên xwe lêborînê dixwazim!... Serokê min, ez dixwazim bibim hevalê jinê, ji ber ku ez azadiyê yek alî, nabînim. Dixwazim bibim hevalê hevala Sema, dixwazim bibim evîndarê evîna rast û mezin! Dixwazim bibim şagirtê te, bibim şervanê hevala Sema û xwe bikim agir. Bi vî agirê xwe ên wekî Şemdîn Sakik bişewtînim! Ez destûr nadim kesên wekî wî navê dilê Kurdistan, bajarê Amedê kirêt bikin. Serokê min, tu serokê me yî, ji derveyî te ez kesekî din napejrînim! ”

Dervazî beşê daşîrê bû. Demhejmara xwe danî ser refê neynika dîwarî. Komek rojnameyên kevin li erdê rêz kir. Pir bixwinsarî çû ser wan, mîna rûpelek nû ser rûpela dîroka lehengiyê zêde bike, biheybet rawestiye. Û her du bîdonê kolonya mîna misk û ember be, bi ser canê xwe de vale kir, bivîneke ji pola got;

“Bila dîrok binvîse, bila dîrok bibe ziman û bêje; wê rok tim û tim geş bimîne. Bila mirovatî bizane, em zarokên agir, evîndarê axa pêxembera ne ku çawa bilbil evîndarê gulê ye!”

Neviyê Şêx Saîdê Pîran, agir berda canê xwe û bidengekî erjeng sirûd avêt;

“Bijî Serok APO, bijî Newroz, bijî hevala Sema, hevala Sema fermandara mine, pêwist e şervan bide ser şopa fermandar! ”

Dengê sirûdên wî, zîndan hejand, ew deng li her deverê zîndanê belav bû. Ji xurtbûna deng, piraniya hevalên wî vinciniqîn û di nav heyecan û tirsê de, derketin hewşê. Lê, hevalek ku wî û Fikrî pir ji hev hezdikir, bilezgîn hilkişî kata sisiyan. Lê, çi bibîne? Fikrî bûye gog ji êgir, bi her du destên xwe mase girtiye û bivîneke bêhempa li hemberî ketinê li berxwe dide. Qet qîr nake, lê, li pey hev dirûşman diavêje. Ew û agir bûne yek û di nava agir de avjeniyê dike. Ewqasî di nav agir de kûr çûye, car cara canê wî xwiya nedikir. Li hemberî vê dîmenê hevalê wî piştî hewldana xuleyan deriyê hesin vekir û agirê wî vemirand. Hevalê wî nema karî xwe ragire, hêstir ji çavê wî yê ku li ber herikandinê bûn, herikî. Nizanîbû çibike, matmayî mabû. Tenê got;

“Hevalê min, çima te wisa kir?”

“Şervan li ser şopa fermandar diçe. Hevala Sema meşeke pîroz kir , lê, alîk kêm ma bû û min temam kir. Şervan û fermandar bêhev nabin û hev temam dikin. Lê, hêvî dikim bila êdî heval xwe neşewtînin! ”

Fikrî kirin nava betaniyê, lê, canê wî ewqas şewitî bû, goştê wî parçe parçe bi betaniyê ve dima. Ew di hemen şevê de rakirin nexweşxanê. Roja din, bû tayrek aza li bihuşta şehîdan.

*Ji bo bîranîna hevalê Şehîd Fikrî Baygeldî.*

*Ew dikevin axê, li asîman*
*Dibin stêrk, şevê diqetînin*
*Dibin ronî ji bona rastiyê....*

## TOLHİLDAN

### 1

Rok ji xewê şiyar bû, dinya kir ronî. Tîrêjên wê ji tîrê kevanê bêhejmar bilezgîn ketin ser axê, biaxê re bûne yek. Axa jiyanê diafirîne mîna dayika zarokên xwe bievîn hemêz bike, ew hembêz kirin. Ji ber hatina roniyê, bizinek kovî jî, li ser zinarekî sekinî bû, serê xwe çep û rast dibir û dianî û keyfa xwe dida diyar kirin. Lê, çawa serê xwe ber bi asîman de rakir, çavê wê bi tayrek baz ket,

heme di cî de ji zinar daket. Ji ber ku dizanî, ger xwe neveşêre dê bibe nêçîra baz. Lê, tayr riya firê berdewam kir.

Hêlîn ji bandora germê, ji xew şiyar bû. Li der û dora xwe nerî. Dûre li hevala xwe Rojîn temeşekir. Rojîn xwe ser kêlekê dirêj kiribû û kefiya reşsipî bi ser canê xwe de kiribû, pê xwe nixmand bû. Çeka wê ya Rûsî a sivik li ber serê wê bû. Piştî qederekê, Hêlîn xwest hevala xwe şiyar bike, lê dudil ma, nexwest wê ji xew şiyar bike. Lê, bêgav ma şiyar bike, lewre çiqas diçû tîna germê zêde dibû. Kire gazî;

"Rojîn, Rojînê, hevala Rojîn. Ev çawa çêbû, Rojîîîn!"

"Çi ye? Çi bû? Kî hat, leşker hatin?"

"Leşkerê çi? Ka rabe em ciyê xwe biguharin. Gav bi gav tîna germê dijwar dibe. "

Her du hevrê, piştçente û çekên xwe hilgirtin, nêzî demhejmarekê meşîn, hatin ber zinarekî, li wir rûniştin. Ev her du şervanê azadiyê ew mehek bû ji refê xwe qutbûyî. Di nava vê dema dirêj de, wisa li wan hatibû, ger kesna ew bidîtane yê birevîne, ewqas hatibûn guhartin. Rûçikê wan ji kirêtê reş bûbû, dest û tilîkên wan mîna ê jinpîrekê lêhatibû. Gelek rojan bêaw û xwarin mabûn. Ev her du heval, piştî şerekî giran li vî çiyayê tev; kevir, teht, lat û zinar dibin mêhvan. Di hemen katê de her duyan pir ji hev hezdikirin. Rojîn ji Başûrê piçûk bû, Hêlîn jî, ji Bakur bû. Her du di hemen salêde tevlî Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan dibin. Ew pênc (5) sal bû jî, gêrîla bûn. Lê, tucarî guman nedikirin yê rojekê ji koma xwe qut bibin. Hêlîn nêrînek avête kevirê pêşber xwe û got;

"Hevala Rojîn, tu dizane min, şehîdbûn, girtin, birîndarî dabû pêşiya xwe, lê, qutbûna ji hevalan demeke dirêj, qet di mejiyê min re dervaz nebûbû."

Rojîn;

"Hevala Hêlîn, bawer bike min jî, qutbûna ji hevalan nedanî bû ber çavê xwe. Niha jî, ez pir jana vê yekê dikşînim û naxwazim bipejrînim. Lê, êdî ev rastiyeke û ne jî, film û xewnên bitirsin. Ev bû demek dirêj em ji hevaln qut, ger niha hin kes me bibîn yê ji vê guhartina me bitirsin. Tu nabîne, pora me, birû, lêv, rû û destê me ketine çi rewşê? Ji xwe neynûkên ling û destê me ewqas dirêj bûne, ger çavê mirovan pê bikeve, ez bawerim yê dilê wan birojan li ber xwarinê bêgirtin. Lê, dîsa ji bo rewşa me, ez asayî û xwezayî dibînim. Ji ber ku bedelê şoreşê û jiyaneke aza ev e, zimanê afirandinê jî, pir cara dibe mercên giran. Bîna bîra xwe, di perwerda û pirtûkên Serok de ev rojên em jiyan dikin derbas dibûn. Serokatiyê tim jiyana çiyan. Aha vaye îro em vê yekê bi xwe jiyan dikin. Lê, pêwiste em zû hevalan bibînin. "

Hêlîn;

"Ev bû pênc sal ez li serê van çiyan, bihêrî û girtina pêşerojê, li pey azadiyê dimeşim û dixwazim bigrim û mîna avek ji avê kaniyên çiyayê Sîpanê Xelatê vexwim, da hemû giyan, xwîn û nawa min bişo. Û heta dawî ez ê li ser şopa Serok bimeşim. Lê, hevala Rojîn, dixwazim pirsekê ji te bikim, gava neyar koma me dorpêçkir, êdî tu çare me nema lewre em ketin şer. Şer sê rojan berdewam kir, pir leşker hatin kuştin, lê, min nedît yek heval şehîd ket. Lê, wê rojê te gote min, min biçarê xwe dit hevalê Çiya şehid ketiye, newisa? "

Rojîn çavê xwe girt, rû bû guleke pelweşî, reng qulipî. Xwiya bû ew dîmen, bi pirsa Hêlîn re, careke din li ber çava zindî bû. Her çiqas nedixwest bersiva pirsê bide, lê, ji aliyê din ve nedixwest hevala xwe bêbersiv bihêle Rojîn;

"Ez çawa bêjim, yan jî, çawa bînim ziman? Birastî min nedixwest ew bûyer bê bîra min. Ji ber ku her tê bîra min, birînên min vedibin û ewqas pê têşim. Raste, min bi çavê xwe dît hevalê Çiya li pişt kevirekî li pey hev gule li neyar dibarand. Cara bo xwe biparêze, ciyê xwe diguhart. Bi şewaza xwe ya şerê serkeftî, pir heval ji xeterê parast. Lê, nizanim çawa bû, heme rabû ser lingan û bidirûşmeyên bijî Serok APO gule mîna baranê bi ser leşker de barand. Lê, min hew dît heval ser piştê ket. Ez di nava guleyan de giham cem. Gule li eniya heval ketibû û xwîn diherikî û pêjin jê nedihat. Dûre ez hatim cem we."

Gava Rojîn, ev bûyer dianî ziman, biaxaftina wê re, dilê Hêlîn parçe parçe û her parçek bû mîna darek ziwa û dûre bû agir, dilê wê di nava agir de ma! Hestên wê di nav agir de bûn pizot. Her du çavê renghingivîn xemgîn bû û ew xemgînî bûne rondik ji çavan barîn, li ser dêman re gindirîn... Rojîn ji rewşa Hêlîn matmayî ma. Ji ber ku wê jiyana Hêlîn ji nêz ve dinasî û gelek xisletên Hêlîn nasdikir. Pir cara dîtibû Hêlîn li ser şehîdan xemgîn bûyî, lê, ne di vê pileya niha de. Rojîn, destê hevala xwe girt û serê wê bi jor de bilindkir û jê pirsî;

"Hevala Hêlîn, qey hevalê Çiya xismekî te bû? "

“Li min bibore, ez çi bikim, nema min karî xwe bigrim. Hevala Rojîn, hevalê Çiya xismê min e. Ez dibim dotmama wî û em destgirtiyên hev bûn. Bavê Çiya û bavê min birayê hevin. Hê temenê me piçûk bû, bavên me soz dabûn hev ku me bi hev re bizewcînin. Ez nikarim veşêrim, me pir ji hev hez dikir, me rojekê bêhev debar nedikir. Baş tê bîra min, piştî temenê me bû panzdeh salî, rojekê Çiya û bavê xwe çûne bajarekî Tirkan û pênc rojan nevegerîn gund. Hingê ez tim digriyam, roj û şev li ber min bûbûn meh. Gava hevalê Çiya vegerî gund, di hemen wê rojê de me destê hev girt û em çûn serê kaniya gund, heta êvarî me henek kirin. Wê demê heval jî, tim dihatin gundê me. Hemû malbatên gund alikarî bi wan re dikirin. Du sal di navê re borî bûn, ez û hevalê Çiya jî, hatibûn guhartin, çiya û axa dayê xwe di dilê me de kiribû gulek. Me biryar dabû em tevlî gêrîla bibin. Lê, berî em herin serê çiyan bi du rojan, neyar êrîş kir ser gundê me. gundî li qada gund kom kirin. Serleşkerekî Tîrk hevaleke birîndar ji gundiyan dixwest. Gundiyan hevala birîndar di nava daristana gunde veşartbûn, lê, tu kesî/ê  ciyê wê diyar nedikir û digotin; tiştekî wisa tune. Dawî de, serleşkerê Tirk têgihişt ku hewldanên wî yê bêencam bimîne. Bigotinekê ferman da leşker boneya êrîş bînin ser me. leşker bûne gorên birçî ketin nava me. Hawara dayik û bavan, keç û xortan, jinpîr, zilampîr û zarokan digha asîman. Erd ji xwîna wan sor bû! Serê min şikest, por û rûyê min di nava xwînê de ma. Dest û serê hevalê Çiya girt û ji nava geremola gondiyan derxist. Nêrîneke nemirovatî avête gundiyan û got; ”

“Ya ew terorîsta birîndar, yan jî, ev keçika bedew(!?) Ez ê wisa bikim ku hemû leşker...”

Li ser wê gotina serleşker ya bêsincîtî, gundî ketin nava tevgerê, xwestin êrîş bikin fermandarê leşkeran. Lê, ji sed lûleyê çekan gundî nîşan girtin. Çavê serleşker agir dibarand, mîna kuçikên ji birçe av ser devên wan bikeve, di nav quncika her du lêvên wî de kef civiyabû. Serleşker gazî sê leşkeran kir û got;

“Ker û kurên keran, zû werin vê dêlikê tazî bikin, tiştekî lênehêlin. ”

Bavê Çiya wekî zarokan digrî, hêstir ji çava dibarî û lêvên wî dilerizî. Heme di wê navê re, kesî nedît çawa bilez êrîş kir ser leşker da namûsa xwe biparêze, lê leşkeran ew gulebaran kirin. Dûre, diya hevalê Çiya, bavê min û xwişka wî gulebaran kirin. Her sê cendik mîna ku lawiran bavêjin ser hev, li qada gund ser hev kom kirin. Qad jî, bû golek xwîn, çavê gundiyan beloq beloq vebûbûn û mîna peykerekî bêdeng bûbûn. Li ber çavê wan gund û zeviyên wan di nava agir de dişewitî. Piştî vekişîna leşkeran şînî bû navê geremolê û li dora agirê ku her tiştên wan dişewitîne diçûn û dihatin. Roja din, ez û Çiya tev birînên xwe tevlî gêrîla bûn. Lê, me soz dabû xwe tola wan û ya gelê xwe rakin. Vêca hevalê, te birîna dilê min naskir?

Çawa Hêlîn axaftina xwe bidawî anî, Rojîn ew hembêz kir. Lê, çavkaniya hestirên Rojîn nedisekinî. Hêlîn, careke din li hevala xwe vegerî û got;

“Lê, hevala Rojîn, hevalê Çiya jî, wekî hemû şehîdane. Pêwiste em tola wan rakin. Tenê dikarim bêjim; wî hezkirin û evîna nav têkoşînê de nas kiribû. Lewre, tim ji min re digot; ‘evîna piçûke, divê em bibin evîndarê evîna mezin û bila tucarî evîna piçûk me bixeyalên vale re mijûl neke.’ Ango, wî xwe dabû vê riya di hundirê xwe de evînê diveşêre. ”

Êdî dinya bûbû şev, stêrik xwiya dikirin, hîv dagirtî ronî dikir. Carcara dengê çirçirkan bilind dibû. Hêlîn serê xwe danî ser çente, çavê ji bêxewî qurimîbûn, ketin ser hev. Lê, Rojîn şiyar ma...

## 2

“Hêlîn, evîndara Çiya yê mirî ku niha mar û dûpişk binoş û can, bikeyf goştê wî dixwin. Ha, haa, haaa Nexwe we soz dabû, hûn tola xwe rakin? Başe, çiya tol rakir (!), niha dora te ye da tu tola Çiya rake, newisa? Na, naaa! Hûn nikarin berberiyê bi artêşa mezin ya Tirk re bikin. Ma çi zû we Dêrsim ji bîr kir? Ma çemê Munzur ku ji xwîna; zarok, ciwan, mêr û jinan sor bûyî. Ji bîra we çûye? Leşker, dest û lingên wê girêbidin û îskanên nêçîra xwe ya nû bilind bikin.”

Şev çûbû, dîsa ji pişta çiyayê pêşberî ciyê wan, rok bilind bû. Rojîn heta beyaniyê şiyar ma bû. Ewqas ji hal ketibû, serê wê ji xwe de hin dengan re. Rojîn vinciniqî. Dengê hin kesan li guhê wê ket. Rojîn li hevala xwe nerî; Hêlîn di nava xwêdanê de bûbû av.

Rojîn, bilez milê wê hejand;

“Hevala Hêlîn, hevala Hêlîn şiyar be. ”

“Ew, ew kanî?... Leşker çûn kû?”
“Heval çi bû?”
“Çi? Aax, min xewin didît.”
“Heval, zû em tiştekî bikin”
“Çima?”
“Ma dengên hin kesan nayê guhê te?”
Hêlîn bilezgavî bi jor ve hilkişiye; leşker ber wan ve dihatin. Bi lez dakete jêr, got;
“Hevala Rojîn, em zû bikin xwe berdin jêr, leşker bi aliyê meve tên.”
Dora du saetan meşîn. Bayek germ dihat, mirev bênefes dikir. Li deverekê rawestiyan. Leşker jî, ber wan ve dihatin. Hêlîn dûrbîn da ber çavê xwe, di cî de cemidî. Piştî dûrbîn ji ber çavê xwe rakir, dîsa danî ber çavê xwe; leşker pir nêzîkî wan bûbûn. Hêlîn zû xwe da hev; wêneyê Çiya, xismê wê û dîmena gundê ku hatî şewtand di nava çend çirkan de li ber çavê wê dubare bû. Bi dengekî hinekî bilind, got;
“Xwedê, ev çi ye, ev çi sûd e?”
“Sûda çi hevala Hêlîn?”
“Ew e”
“Ew kî ye?”
“Ew e ew ”
“Erê heval, ew kî ye?”
“Ew fermandarê gundê me şewitandî”
“Êêê!”
Hêlîn li pêşberî hevala xwe sekinî, destê wê girt û guvaşt, zîqli nav çavê Rojîn nerî, got;
“Guhdarke hevala Rojîn, tu here xwe bighîne hevalan, her tiştê me jiyan kirî, ji wan re bêje, ez ê dermanê vî hovî bidmê”
“Naa, ez vê yekê napejrînim, ev nêzîkbûna te neraste. Ez ê çawa te bitenê bihêlim? Na heval, wisa nabe, hejmara leşkeran pir e, şer destpêbike em ê her du şehîd bikevin! Ji aliyê din ve jî, divê em zindî bighin hevalan. Hevala Hêlîn, ev bû demeke dirêj em dûrî hevala ne, lê me xwe parast. ”
“Hevala Rojîn, ez hêvî dikim tu gotinên min pêk bînê. Ez hestê te yê pîroz dizanim, lê, pêwist e tu xwe bighînê hevalan. Heval, bila ev firsend ji destê min neçe.”
Diviya bû yek zindî bighaye komê. Rojîn bêçare ma. Her du yan hev hemêz kir û rûyên hev ramûsandin hêstir bûne nîşana xatirxwestinê.Hêlîn ji derveyî çeka xwe du narîncokan, hemî tiştên xwe yê din radestî Rojîn kir, Rojîn bidilkovanî xatir xwest û çû.
Hêlîn ma bitenê. Careke din dûrbîn da ber çavê xwe;leşker pir nêzîk bûbûn û serleşker di nava wan de xwiya dikir. Hêlîn çeka xwe rast kir û berê lûlê da serleşker.Hêlîn hew dît çavê wê ji serleşker girt û başebaş nîşan ji eniya wî girt. Ji nîşana xwe pir bawer bû û nejixwe de hevalên wê digotin; “hevala Hêlîn di nîşanê de kes naghiyê.” Û di guleya yekemîn de, serleşker ser piştê ket. Bikuştina serleşker re, bû qîra wîra leşkeran, her yekî bi deverekê ve bazde. Mîna topek bikeve nava wan, tirsiyan. Lê, dîsa leşker gihane hev. Gule mîna baranê bi ser Hêlîn de barandin. Hêlîn çar leşkerê din jî, kuşt. Lê, Hêlîn ji ling û pêsîra xwe birîndar bûbû, êdî baş dizanî nema dikare şer bike û hêviya felata wê jî, nema bû. Xwîn ji birînên wê pir dihat. Nema dikarî baş tevger bike. narîncok kire destê xwe. Berî xelekê bikşîne, bixwîna xwe li ser kevir nivîsî; TOLHİLDAN ! Û bidirûşma bijî Serok APO, xelek kişand. Bû parçe parçe û her parçek bû kulîlikek ji kulîlikên sor!

*Dixwazin me qirbikin,*
*Dixwazin me nehêlin,*
*Lê em evîndarê azadiyê ne*
*Ji bo maf û azadî*
*Tim xwe diafirînin!*

## KOMKUJÎ

Li ser gogcîhanê,lê, li herêma Mezrabotan demsal bûbû havîn. Her çiqas li hin çiyan parçên berfê xwiya dikir, li hin car cara li asîman ewr diciviyan jî, rok bûbû serdestê xwezaya Kurdistanê. Ji xwe, zagonên jiyana li vî welatî ev e; gih dibe havîn û zivîstan, gih jî; bihar û payîz. Ev her çar stûn hîmên bingehînin yê jiyanê. Dor jî, dora havînê bû. Roka pîroz, peywira xwe biserbilindî dianî cî û hemû sirûşt bi tîrêjên xwe yê afirînarî hembêz kiribû. Lewre, hemwelatiyên welatê morîstanan, morî ji welatê xwe derketbûn ser erdê û amadahiyên zivîstanê dikirin. We li kîjan alî nerî ban, weyê komên moriyan di nava disiplînekê de bidîtane li pey hev dimeşîn. Hin ji wan diçûn bar, hin jî, bar di devê wan de, berê wan li welatê bin erdêbû. Kêzik, marmarok û kulî jî, li ser axê digeriyan. Çîw çîwa çûkan ji ser daran bilind dibû û tevan keyfa xwe ji tavê re dianî.

Lê, Dilar di oda serneylonî ya pirtûkxanê de bû. Di destê wê de pirtûka Serokê netewî ya bi navê pirsgirêka kesayetî hebû. Piştî çend rûpel ji beşa ser xisletên mirovên kadir xwend, danî ser refika pirtûkxanê, çeka xwe hilgirt û derkete der. Di cî de, dijwariya rokê çavê wê miç û belo kir. Beşişî û got;

"Te yê dîsa tac daye serê xwe û bûyî serdarê cîhanê!"

Çû li binê siya darekê rûnişt. Çeka xwe bibal vekir, kire parçe parçe û li ser kefiyeke kevin, li pey hev rêz kir, hêdî hêdî destbipak kirina wan kir. Ev necara yekem bû, Dilar tim çeka xwe mîna bûkekê dixemiland. Wê her tiştê xwe kiribû çek û kêliyekê dûrî wê nediket. Mirov digot qey bûye evîndarê çekê. Lê, piraniya hevalên wê digotin;

"Tolhildaneke mezin û kîneke bêsînor di çirûskên çavê wê de, têndîtin."

Dîsa hevalên wê di nava xwe de digotin;

"Hevala Dildar bûye şahidê komkujiyek erjeng, ji ber vê yekê bûye evîndarê çekê."

Du hevalên wê bi navê Jana û Wijdan pir dixwestin guhdarî çîroka komkujiyê bikin. Gava çavê her duyan bi Dilar dikeve, berê xwe didin Cem.

Jana;

"Dembaş hevala Dilar"

Wijdan;

"Tu çawayî hevala Dilar?"

Dilar;

"Pir sipas heval, fermo rûnin "

Her sê çarmêrgî rûniştin. Dilar parçên çeka xwe yek bi yek li hev siwar kir. Jana qutiya titunê ji bêrîka êlekê xwe derxist. Sê çixare pêçan. Dûmana çixarê di nava cavatê de bi jor ket.Û gotûbêj çiqas diçû, dirêj dibû. Li perwerda siyasî û leşkerî sekinîn. Pêşketinên dawî û valekirina gundan ji aliyê dewletê ve anîn ziman. Bere bere Jana çixare dipêçan. Wijdan hilmek ji çixarê kişand û got;

"Hevala Dilar, pir heval çêl çîroka te û komkujiyê dikin. Tu rastî bixwaze, em jî, dixwazin vê çîrokê ji devê te bibhîzin"

Dilar;

"Hûn dixwazin çîroka min û ya komkujiyê guhdar bikin? Lê, dixwazim bêjim, rûpelên vê çîrokê tev bixwîne. Ev çîrok rastiya gelê ku jiyana xwe tev birîn û jan e! Hemû hevokên vê çîrokê binîşanên; derd, keser, kovan û bixemgîn hatiye nivîsandin. "

Carekê Dilar sekinî û mîna ku çîrokê bîne bîra xwe li erdê, li pêşiya xwe nerî û got;

"Ez di zivîstaneke kembax de hatim dinê. Wê salê gundê me bûbû dîlê berfê. Berf hingî barî bû, kesî nedikarî gavekî bavêje pêşiya malê. Ne em tenê, hemû lawir bêdeng bûbûn. Rê û rêbar hatibûn girtin. Me abora xwe bi tiştên dest de jiyan dikir. Bavê min jî, hê ji havînê ve êzing bo zivîstanê dabûn hev. Ev gotinên ku ez dibêjim yê bavê minin. Wê çaxê dayika min ducan bû û ez di malzarda wê de bûm. Rojekê jana weldandinê dayika min digre. Li gor bavê min digot, qîrînên dayika min, kezeba wî dişewitand û ji bêçaretî direvî oda din û serê xwe dikire nav lingê xwe. Dûre bikutekî pîrika gund tîne. Lê, piştî têm dinê, dayika min tevlî karwanê miriya dibe. Bavê min jî, ewqas bi dayika min ve girêdayî ye û jê hez dike, ji ber mirina dayika min nexweş dikeve.Nexweşî sal bi sal pê re mezin û kûr dibe. Riya xwe naqusîne, pora wî sipî dibe, giranî dide çixarkişandinê. Temenê min jî, bûbû heşt (8) salî. Rojekê mamê min gotiye;

"Xwedê ji te razî, bizewce, were ser xwe, te mîna fîndekê xwe heland."

Lê bavê min bersiv dayê;

“Piştî çavê wê, jin li min heram bin ”

Bavê min pir kedir û qîmet dida min. Hemû jiyana xwe bo min derbas dikir. Belku rojê deh cara ez maç dikirim û ji min re digot;

“Berxika min, gava ez te dibînim, dayika te tê bîra min. Çavê wê jî mîna yê te reşzeytûnê bûn, pora te çawa ji rengê şevê ye, ya wê jî, wisa bû...”

Lê, hê ez heşt salî bavê min jî , bi wê nexweşiyê çavê xwe girt. Dema bavê min mir, mamê min, ez birim cem xwe. Birastî tiştek ji min kêm nedikir. Lê, jinapamin nedixwest çav li min bikeve. Zikreşbû, çavteng bû. Heta mamê min çend cara ji bo min ew rêkire mala bavê wê. Lewre, jinapamin cihêtî dikir navbera min û zarokên xwe. Temenê min jî, bûbû panzdeh salî, êdî ji berê bêhtir min tişt fêm dikirin. Boneya jinapa min gotinekê nebêje, ez dibezîm hemû karan. Min kinc û virax dişoştin, av ji kaniyê dianî. Û heta gelek rojan bi zarokên mamê xwe re diçûm ber pez. Her çiqas mamê min nedihişt ez kar bikim, lê dîsa min karê malê dikir. Mamê min mirovekî pir baş bû. Temenê xwe li dora çil salî bû. herweha welatparêzekî jîr bû jî. Pir karê hevalan dikir. Ew gelekî bi serok û hevalan ve girêdayî bû. Nayê bîra min ku heval ji mala apê min qutbûyîn. Lê, gava heval dihatin, lêvê jinapa min gazekê dihate daleqandin, mirûzê xwe tirş û tehil dikir. Lê, apê min her û her ew şiyar dikir û gef  lêdikirin. Dûre apê min, du kurê xwe rêkirin serê çiya. Êdî demek wisa hat, gundê me çêkiribûn. Heval ji gund qut nedibûn. Ji gund jî, panzdeh ciwan tevlî nava refê gêrîla bûbûn. Dewletê jî, agahiyên berfireh dermafê gundê me de bidest xistibû. Li ser vê, çend cara leşkeran êrîş anî ser gundê me, lê, êrîş bê encam ma bûn.

Lê, carekê, êrîşeke berfireh anîn ser gund. Leşker bêhejmar bûn. Baştê bîra min, wê demê zivîstan bû, li dora danê nîvro bû. wekî lawirên hov ketin nava gund. Em gundî hemû kom kirin, leşkeran li dora me xelekek çêkirin. Bê yek pirsê ji me bikin, ketin nava me, gih li me dixistin û gih em tazî dikirin. Di nava nîv demhejmarê de, em tazî di nav xwîn û heriyê de hiştin. Ji nav wan leşkeran, nêzîkî bîst(20) kesî kum dabûn serê xwe û rûyên wan girtî bû. Tenê; çav, poz û devê wan xwiya dikir. Van kesên rûveşartî sê zilam girtin û dane ber guleyan. Dûre yekî din derxistin, di cî de avêtin erdê, yekî ji wan lingê xwe danî ser zikê wî, yekî din jî, lingê xwe danî ser serê wî û kêrek ji ber xwe derxistû bilez guhê wî jêkir, bi jêkirina guhre, xwîn herikî! Li hemberî vê dîmenê, zilam wekî zarokan digriyan, jin û keçan dikirin hawar, porê xwe dikşandin û kulim li xwe, li sing û serê xwe dixistin. Hêstir bûne lehî û ceger diperitîn! Lê, ya herî giran rewşa keçika ciwan bû. Ew girtin, anîncem serleşkerê; çav beloq, ûr mezin, kin û ser zelût. Bi fermana ew kirin gog di nava xwe de. Keçik tazî û her yekî dirêkir ji yê din re. Ew diq diqandin û destê xwe diavêtin her derê wê. Dûre her du keziyên wê yê dirêj û rengreş ji binîve, bikêrê jêkirin. Ji lingê keçikê heye serê wê tev bûbû herî. Hingê kiribû qîr û hawar, nema dengê wê dihatin. Gundî tev direcifîn! Tirsa mirinê ketibû dilê tevan û derûniya wan bûbû mirin! Gava vêcarê jin û zilamek (her du jin û mêrê hev bûn ) ji nava xelekê derxistin, di çavê tevan de hevîya jiyanê bar kiribû. Li ber çavê zilam dest avêtin jina wî. Serleşker gazî gundiyan kir;

“Ger ez yekî ji we zindî bihêlim, bila hûn...”

Em tev rêzkirin û berê çekan dane me. Gava em gulebaran kirin, min zû xwe avête erdê. Jixwe ji derb û lêdana wan, her devera min bûbû xwîn. Wan ji, digot me hemû kuştin, kesek zindî nemaye. Lê, bi vê komkujiyê ve sînor kirî neman, hemû lawirên gundiyan dane ber gulan û agir berdane daristan û xaniyên gund. Ez jî, piştî leşker çûn, rabûm û ketim ser riya çiya sê rojan bêxwarin, tev birînên xwe li hevalan geriyam, heta min heval dîtin. Belê hevalno, çîroka min ev bû.

Çavên Jana û Wijdan bûbûn kaniya hêstiran Jana got;

“Ev çîrok rastiya jiyana gelê me ye. Û nimûneyeke ku gelê me çawa bedelê gihandina azadiyê dide...”

*Lewre*
*Ew jiyanin*
*Di dilê jiyanhezan de.*

## STÊRKEK

### 1

Ew demek bû, zivîstan bûbû bablîsok; li çiya, deşt, newal, gelî û li daverên curbercur digerî û jiyana mirov û lawiran kiribû nava zîndana xwe, bû asteng li pêş tevger û lebata wan. Berf, baran, bager, tayrok, seqem û serma li ser dika erdê şûrê xweyê tûj dihejandin. Ma kî dikarî li hemberî derbên şûr serê xwe rake? Bilbil, çûk, tayrik di hêlînên xwe de tevizî bûn. Marên jehrî ketibûn xewa dirêj, dûpişk nediwîrîn derkevin. Gur û rovî birçî mabûn... Lê, di dilê zivîstanê de, wê rojê te digot qey dinya bûbû bihar ewqasî, xweza xweş û zelal bûbû. Ewrên reş demdemî jî, be li ezman winda bûbûn. Ji xurtbûna rojê, xwiya bû pir li berxweda bû... Çemê ku di navbera her du çiyan de diherikî jî, tîrêjên rojê bi pêlên piçûk pêşwazî dikir. Pêl û tîrêj dibûn yek, bi hev şadibûn. Çivîkên dengxweş mîna pirpirîkan li ber çem govenda firdanê dikirin, gih li ser wê darê bûn, gih jî li ser vê darê bûn, ahengiyek tekûz derdixistin ser qada jiyanê...

Gulnaz;

"Bavo bixwedê yê dibên ew ji me hez nake, neraste"

Jiyan;

"Tew tew, ger ji me hezkiribane, niha em ne li serê van çiyan bûn."

"Ma hûn dizê wî ne? Camêr di nava zivîstanê de, ji we re her dever kiriye bihar. Lê, ez we şiyar dikim, têkildarê karê wî nebin, lê bi xwedê we hew dît tofan rabû."

Cîhan;

"Min bixwe derbên wî pir dîtine, lewre, bixwedê ez nikarim têkildarê wî bibim. "

Piştî her çara kinc û serê xwe şoştin li ber germa rokê ku kesekî hêvî nedikir di wê rojê de çavê xwe veke. Cîhana bejin navîn, çavşîn, por genimî û reng sorik ji Nisrîn re got;

"Bêpêkenî, îro sûda me heye. Ev demeke dirêj bû ku me nedikarî ji berf û baranê karekî birêk û pêk bikre. Ez bawer dikim heta zivîstan biqedê em rojeke wisa xweş nabînin. Lê, tu dibe qey ew dizane îro meşeke dirêj li pêşiya me ye, lewma dinya xweş kiriye. "

Nisrîn;

"Hevala Cîhan, mirov dibe qey tu ji pirtûka pîroz dipeyîve. "

Cîhan pora xwe kire destê xwe, li Jiyan û Nisrîn nerî. Lê, dîsa berê xwe da Nisrîn û got;

"Hevala Nisrîn, ji te re nebe giranî, tu dikare pora min şeh bike? "

Nisrîn;

"Ev çi gotinin koçerê? Ma ez pora te şeh nekim, ez ê ya kê şehkim? De were cem hevala xwe"

Çawa Nisrîn gotinên xwe qedand, dengê kenê Gulnaza Başûrî û diyana Rojhilatî bilindbû, ewqas kenîn hêstir ji çavê wan barîn.Cîhan jî, tevlî kenê wan bû. Cîhan ji Başûrê Piçûk ji gundekî Dêrika rengîn bû. Ew bi xwe ji koçeran bû, lewre gava hevalên wê pê re henek dikirin, digotinê Koçerê. Cîhan jî, bigotina Koçerê dilşa dibû, ji lêvên hingivîn kenekî şekirî dibarî. Cîhan bi çend gavên piçûk xwe gihande Nisrîn, mîna zarokeke ku çawa pora xwe radestî dayîka xwe dike, wisa pora xwe radestî hevala xwe Nisrîn kir.

Û got;

"Hevala Nisrîn, xalekê bala te nekşand?"

Nisrîn;

"Weke çi?"

Cîhan;

"Em çar heval li ber çemin, her yek ji me ji parçekî Kurdistanê ye. Ango, me Kurdistan kire yek parçe û niha em nonertiya yekbûnê ne. Em nîşana welatê ku bi sed salan nebûyî yek, yekbûna wê tînin ziman. Ne wisa ?"

Nisrîn;

“Ma çawa ne wisaye, hevala min? Me ji mêj de welatê bûyî dergûşa mirovatiyê, kiriye yek. Bi serokatiya Serok APO,  me şoreşek di giyan, hest û mejî de li darxist. Em çar heval jî, sembola yekîtiyê ne. ”

Jiyan ew her du guhdar dikir, çawa bîdonê avê dagirt av, bi şêwazek pêkenî got;

“Wey wey... weleh zor başe, Cîhan û Nisrîn gotinan bizimanekî helbestî dirêsin. Bavo bi xwedê ev çiya bi ser me de newin xwar, ev çemê delal ne çikê, pir baş e. De zû rabin ser xwe hê ez nehatîm we. Kincên me ziwabûne, em wan bidin hev û herin, lênexwe em ê dereng bimînin.”

Her sê hevalên wê, di nav ken û pêkeniyan de kincên xwe dane hev, bîdon dagirtin av û berê xwe dane wargehê. Gava gihan wir, hemû hevalên wan li benda wan bûn, da birêbikevin. Ji ber ku berî demekê ji biryargehê ferman boneya wan hatibû da vekişin. Piştî kêmhejmara wan temam bû, bi yek dengî sirûda, “bi can, bixwîn, em bi te re ne ey Serok” avêtin, şervanên ava dîrokî, şagirtên mirovê pîroz ketin riya dirêj...

**2**

Dimeşîn di nava xwêdana pêşerojeke azad e ku ji eniya wan diherikî! Dimeşîn ber bi hêviyek nû de, ber bi rojeke ronahî de dimeşîn... Lê, êdî şev bûbû hevalê meşa wan. Pêdivî bi bêhinvadanekê dîtin. Cîhan, bikefiya ku dayika wê diyarî dabûyê, xwêdana enî û rûçikê xwe ziwa kir. Lê, gih gotin di nav avhewake bêdeng de, di mêjiyê wê de dibûn zincîrek ji pizotên êgir, gih jî, gotin ji nava lêvan difilitîn xwe dighandin perda guhê wê. Lê, carcara jî, lêv dilerizîn, agirek digirte gewriya wê û rondikên şewat li ser dêman digindirîn ta enîşka lêv û ji wir dihatin xwar. Li asîmanê ku berî çend katijmaran sayî bû, lê, niha ewir lê dicivîn, nerî. Dûre li derdora xwe nerî û got;

“Jiyan; bêçiya, zozan, çem û xweşiya biharê nabe!..”

Bifermana fermandar, koma gêrila kete meşê. Ewir hêjî dighan hev. Lê, hê ewrên giran û li ber zayînê başebaş li pêş hîv û hin stêrkan nebûbûn perda reş. Cîhan li asîman nerî, dîsa serê xwe kire berxwe û bidilxemgînî got;

“Ev çi ye? Dema em ji wargehê birêketin, dinya mîna golekê bû, lê, niha ev gul ber bi çilmisandinê ve diçe. ”

Dilê Cîhan lêdixist, gelek guman di hişê wê re dervaz dibûn û pê re lêvên xwe gez dikir. Ew wisa di nava ramanan de, gule teqîn, biteqîna guleyan re bi erdê re bû yek. Di nava çend xuleyan de hawîrdor bû dojeh! Bêhna barûd û dûmanê belav bû, her dever kir bin bandora xwe. Ji barîna guleyan yek şervanî /ê serê xwe ranedikir. Lê, Cîhan birîndar bûbû, xwîn ji birîna wê dihat. Cîhan bi her du destê xwe çek jidand  û got;

“Me şer rawestand, me destê aşitî û biratiyê dirêjî wan kir, lê, ew bibêbextî nêzîkî me dibin. Lê, bila baş bizanin, em tucarî riya Serokê xwe bernadin. Em ê tim li ser şopa wî bimeşin. Ew dixwazin me bînin leyistikan, lê em nakevin davikên wan û em tucarî jî, radest nabin!...”

Berê şer da ser xwe, hevalên wê jî divekişîn. Êdî Cîhan şer dikir û hevalên xwe yên divekişîn diparast. Tilîka wê ji ser dîkê çekê nerabû. Lê, derbeke xedar li canê wê ket. Tenê karî bêje; “Bijî Serok APO!”Cîhan tevlî karwanê şehîdan bû. Cîhan bû şewqek û ber bi asîman ve hilkişî. Ew bû stêrkek û hevalên wê,di bin ronahiya wê de, gihan biryargehê!

*Ew in ew!*
*Jiyanê diafirînin...*
*Navê xwe;*

*Zîlan in,*
*Bermal in,*
*Leylan in,*
*Bêrîtan in!...*

# CANGORÎ

## 1

Nizanim ew çend meh bûn, cîhan hundirîna wê di nava şerekî de bû. Bêhestiyarî, tîrên kirêtkuj bare şanên; bêxêr, kevin û xisletên paşdamayî yên kesayetiya xwe dida. Ew ne rojek, nemehek bû, ew bi mehan bû di nava têkoşîneke tuj de. Her ku şerê hundirê wê kûr dibû, xwîna rayên wê û giyana wê zelal dibû. Lê, pir jan dikşand, pir diponijî. Ew bûbû avjenîkara deryaya ramanan. Cara jî, xwe kûr kûr noqî vê deryayê dikir. Hişmalika wê bûbû gerok di nava cîhana pirtûkan de, rûpel rûpel dixwend û diqulipand. Dîrok di ber çavê xwe re derbas dikir, ew rexne dikir û li ber dîrokê xwe rexne dikir!...

Dîsa wekî heroj li ser wî zinarî rûnişt. Ji bêrîka êlekê xwe lênûska berîkê derxist, ji nava rûpelên lênûskê wêneyê Serok rakir, kire destê xwe yê çepê û got;

“Serokê min, ez dizanim we vejîn afirand û jiyan da şêneyê Kurd. We gelê Kurd zindî kir û rûpeleke nû di dîroka mirovatiyê de vekir. Lê, îro dewletên paşverû û hin kesên mejî û kesatî kirêt ku bi giyana xwe dikin pir bo êrîşên li ser te, dixwazin felsefeya te ya çareser kirina pirsgirêkên mirovatiyê ji holê rakin. Dixwazin we rakin û mirovatiyê bikin şikefteke tarî!... Serokê min, min bi şev û roj hevaltî bi pirtûkan re kir û min hawara xwe gihande hemû pêxemberan; Îbrahîm, Zerdeşt, Mûsa, Bûda, Îsa û Muhemed. Min gazî hemû fîlozof û serokan kir; Sokrat, Galîlî, Marx, Engels, Lenîn ... lê tevan bersivik da min; ‘Keça welatê roj û agir, hêza serkeftin û azadiyê mirev bixweye! ’ Serokê min, ez...”

Lê dengek;

“Hevala Rojbîn, hevala Rojbîn”

Ew deng ramanên Rojbîn parçe parçe kir û bû cewbira xeyalên wê. Lê, binazik got;

“Fermo hevala Dîrok”

“Heval, xwarin amadeye”

Rojbîn nêrînek avêt rokê, lê dicî de çavê Wê ji bandora xurtbûna wê hêstir barandin. Piştî çavê xwe firikand, got;

“Hêza rokê, bênimûneye!”

Ji zinar xwe berda xwar, çû cem hevalên xwe. Hevalên wê li binê çiya darê li ser xwarinê rûniştîbûn. Rojbîn gava giha cem wan got;

“Xwarin dewlemende. Ez bawerim paşayên Osmanî tucarî xwarinek wisa pir reng û bihezkirin nexwarine. ”

Sifra xwarinê ji, birinc, fasoliye, giya, pîvaz , nanê sêlê pêk hatibû. Li ser gotina Rojbîn, dengê ken ê cıvata xwarinê bilind bû. Lê, ew deng di nava dengê xwişîna avê de winda bû. Rê ji Rojbîn re vekirin. Tevahî hevalên wê jê hez dikirin, rêz jêre digirtin û piştî bû fermandara desteyê jî, bêpirsgirêk endamên desteyê fermanên wê di anîn cî. Lewre, Rojbîn biwan re dibû yek, xwe ji tu karî nedida paş. Lê, berî çend mehan newisa bû. Kesayetiya wê mîna tawiyên biharê bû; ken û zivirbûna wê, cidiyet û henekên wê nediyar bûn. Pozê we tim bilind bû, xwe dûrî karan dikir, nexwezayî bû. Gotin bi mûçingê dihelbijart û li hemberî hevalên xwe bikar dianî. Tim digot ez û nekesek din. Di hemen katê de çar demsal bihev re jiyan dikir. Cara rûyê wê dibû bihar û havîn. Lê, cara jî, dibû payîz û pelên kesk ji rûkên wê diweşîn û dibû zivîstan. Û birûsk, baran ji rûyê wê kêm nedibû û hevalên wê jê direvîn. Lê, niha her hevaleke wê dixwest li cem bimîne, nedixwest jê qut bibe ewqas pêve hatibûn girêdan. Ji ber ku hezkirin jê diforî! Ji bo wê, êdî xeta Serokatiyê bingeh bû. Ji ber ku dît, gava xwe nêzîkî xetê kir û ket nava keda yekbûna bi Serokê netewî re, deriyê jiyanê li pêşiya wê vebû...

Piştî xwarinê, rêvebiriyê gazî wê kir da herê bajarekî ji bo xebatên gel. Ev pêşniyariya rêvebiriyê pejirand û got;

“Ji bo hemû kar û xebatên rêxistinê, ez amade me. ”

Dema xatir ji hevalên xwe xwest, piraniya hevalên wê bibandor bûn. Hinan ji wan du cara ew hembêz kir û di çavên wan de av civî. Hinan jî, hêstir barandin. Û çû...

**2**

Mal bi mal digerî, heta nîvê şevê di civatên malbatan de diaxifî. Rastiya şoreşê û Serokatiyê, erkên welatparêzî û bicî anîna van erkan dianî ziman. Ew li dora xetê kom dikirin. Rastiya jiyana li bajarên Tirkan û pişaftina ciwanan di nava kirêta van bajaran, bi keç û xortan dida nasandin.Lê, dewletê êrîş dikir, sînor nas nedikir, kes guhdar nedikir û riya kuştin, revandin û êrîşkirina ser girtiyên şerê azadiyê berdewam dikir.Rojekê Rojbîn ji xwe re got;

“Pêwiste ez gavekî bavêjim, tirsekê bikim dilê neyar. Hevala Zîlan çalakiyek dîrokî li darxist û dewlet hejand. Tirseke mezin kire nawa artêşa xwebêtirs didît û pakî ji tu hêzan nedikir... Niha jî, dixwazin dek û dolaban li hemberî Serokê me pêk bînin. Ez bêdeng namînim, divê ji aliyê xwe ve pêngavekî bînim cî.”

Êdî ew û pêkanîna livbaziyê bi hev re radizan û şiyar dibûn. Piştî ew biryara pîroz da, birojan li bajêr gerî, bipisporî her dever di ber çava re dervaz kir. Li ser her xala têkildarî livbaziya xwe, bibal disekinî, ta ew roj hat. Wê rojê ewqasî xwe xemiland bala gelek xortan kişande ser xwe. Li hemberî wan awirên biyan, zivir dibû, lê, dîsa xwe digirt. Piştî kolan xilaskir, li malekê bû mêhvan. Li vê malê çû ber neynikê, li xwe temeşekir; kirasek nûjen li xwe kiribû, lêvên xwe sorkiribû û pora xwe diberiqî. Li hember vê dîmenê kenî û got;

“Kesek min nerevîne? ”

Pileya germhewaya havînê bilind bûbû. Hilim ji riyên qîr bilind dibû. Ji germê, gera mirovan kêm bûbû. Rojbîn, ew sê saet bû li wê malê. Li odeke bêkes, xwe ser piştê dirêj kiribû, ew û cîhana xeyalan bûbûn heval. Piçûkatiya xwe, xwişk û bira û bav û dayik; tevlibûna gêrîla, jiyana li serê çiyan û hevalên xwe yên şehîd ketîn, li ber çavê xwe zindî dikir. Lê, Zîlan riya xwe didît! Carekê rabû ser xwe, pişta xwe da dîwar, li katijmara xwe nerî û got;

“Êdî wexte, pêwiste ez dereng nemînim. ”

Bê ku xwidanên malê pêjna plan, armanc û mabesta wê bikin, xatir ji wan xwest. Berî lingê xwe bavêje kolanê, ji xwe re got;

“Wekî şoreşgerê mezin Ernesto Ceh Guevara gotî; ‘bihêza xwe bimeşe, ew riya serkeftin û azadiyê ye.’ Ango, serkeftinê însan bi xwe diafirîne!”

Dinya hêjî germ bû, tîna germê berdewam dikir. Lê, Rojbîn pêjna tiştekî nedikir. Tenê cîhana wê digot;

“Hêz însane, serkeftin însane, azadî însane! ”

Heta dawiya kolanê meşî, li ber deriyê şerabxanê sekinî. Li hundir nêzîkî panzdeh polîsan rûniştîbûn. Dengê strana Îbrahîm Tetlîs ya bi navê “ zalim zalim ” ji kanala D xweş dihat. Bala polîsan ji tiştekî nebû. Her yek ketibû nava serpêhatiyên xwe yên bi xwîn! Hin ji wan çêl lêdana ku li ciwanan kirîn, dikirin. Hin ji wan jî, çel destavêtina keçên Kurdan dikirin...

Dengên ji hundir, xweş dihate guhê Rojbîn. Çavê wê sorbûn,lê, rondik nebarîn. Lê, dilê wê bûbû agir û dişewitî! Û bigavên lez Rojbîn dervazî hundir bû û kire qîr;

“Bijî Serok APO!”

Ji dengê teqînê erd hejî! Xwîn, bêhna barûd, şewat û agirê gur tevlî hevbûn. Cendekên polîsan çep û rast li erdê belav bûbûn. Lê, Rojbîn bûbû parçe. Ew parçe bû rûpelek û li ser wê rûpelê nivîsîbû;

“Serokê me, tenê Serok APO ye. Em cangoriyê Serok APO ne. Lewre, ew riya rizgariya mirovatiyê û azadî kirina jinê ye!”

*Ji bo evîna mezin*
*Her dilopek xwêdan*
*Mezintirîn rûmet e!...*

## “EVÎÎÎN!...”

Zivîstan reş birîneke kûr di dilê kîşwera biharê de vekirbû. Hemî xweşiya biharê daqurtî zikê xwe kiribû. Asîmanê çîksayî di nava ewrên reş û tarî de winda bûbûn. Êdî stêrkên geşagir Çiyayê Agirî ronî nedikirin. Agirî di nava dorpêça reşiyê de, dialî! Ewqas dinalî, te digo qey pêjna nexêr bûyerekê dikir. Bêrawestan baran dibarî û ewrên kembax hê girantir dibûn, dibûn yek û wisa bi hev ve hatin cebirkirin, êdî tu hêz nikaribû wan ji hev belav bike. Û bager...

Sê şervanên azadiyê, mîna sê tayrên ji refê xwe qutbûyî, ji koma xwe qutbûbûn. Kemîna ku neyarê çavsor li ser riya komê vedabû... Piştî şerê çar rojan, koma şervanan biberxwedaneke bêhempa kemîna bêbext birîbûn û xwe ji dojeha bênavnîşan xilas kiribûn. Lê, wekî kevirekî bibe parçe parçe, her parçek bi deverekê ve here, wisa koma gêrîla bûbû parçe, ji hev belav bûbû, têkiliyên wan ji hev hatibû birîn. Sê gêrîla jî, bûbûn mêhvanê çiyayê Agirî.

Evîna çavzer bikeziyê xwe yê renghine girt û guvaşt, da ku ji avabaranê ziwa bibe. Lê, Evîn bêreng bû, rû mirûz kirîbû, dilê wê nerehet bû. Tenê dixwest bilezgînî peywendiyê bihevalên xwe yê komê re, girê bide. Berê xwe da her du hevalên xwe, Dijwar û Sîpan, got;

“Em dikarin însîyatîfa xwe bikar bînin. Lê, têkilî pir giringe! Bêtêkilî dê merc li me bibin dojeh! ”

Sîpan serê xwe rakir, li nav çavê Evîn nerî û dûr çû. Rojên berê mîna filmekî anî ber çavê xwe. Roja ku bavê wî Evîn ji xaltîka wî xwestibû û gustîlik kiribûn tilîka hev anî bîra xwe. Lê, dûre her duya biryar dabû bibin zarokên axê û berê xwe dabûn çiya. Her çendî, xeyalê zewac û avakirina malbatekê car cara di hişê wî re derbas dibû jî, lê dîsa evîna axê ew xeyal belav dikir. Niha gelekî dilxweş bû, bejin dirêj, dagirtî, çavşîn û por xelek bû. Sîpan kenî, kenê Sîpan ji çavê Evîn nerevî. Evîn têgihişt ku çi raman di hişê Sîpan re dervaz dibe, ew jî, kenî û bû hevkarê Sîpan. Lê, Evîn zû xwe da hev û got;

“Hevalno, hûn dibêjin çi? ”

Dijwar;

“A rast, ez dibêjim em birêbikevin. Ji ber ku ciyê ku lê şer rûda bû, ji me ne dûre.”

Sîpan;

“Ez jî, tevlî hevalê Dijwar dibim. ”

Li ber keviya zinar çentê xwe hilgirtin, her sê biçiyayê Agirî ve hilkişîn. Baranê jî, qet navber nedabû û bimişînî dibarî. Ji her derê av diherikî. Bi sedan cokên avê çêbûbûn û berê xwe didan gelî. Ne tenê ava baranê, berf ji, dibû av û tevlî ava baranê dibû. Cara rengê avan dibû herî, cara jî, kevirê hûr di nava wan avan de ber bi jêr ve dihatin. Û herî bûbû parçek ji jiyana wir. Lê, derê av dibûn lehî, herî noqî nava xwe dikir. Dengê birûskan jî, kêm nedibû. Her birûskek dibû valekirina ewran û baran xurtir dibarî... Evîn li pêş, Dijwar li pey û Sîpan li dû Dijwar, dimeşîn. Ewqasî meşîn, çokên wan şistbûbûn, xwêdan ji her deverên wan re avêtibû der. Piştî meşeke dirêj, gihan riyeke teng û piçûk û kevirî. Evîn hêdî hêdî gavên xwe diavêt. Lê, di wê navê re kevirek di binê lingê Evîn de xindirî û Evîn li ser dev û rûyê xwe ket. Û di gelî de hate xwar. Dijwar û Sîpan li hemberî vê ketinê cemidî û matmayî man, di ciyê xwe de sekinîn û binêrînek bêçare û dest ling girêdayî li gelî nerîn. Ji xwe çiyayê Agirî, çiyayê bilind, çiyayê ku tucarî serê xwe ji neyaran re netewandî, ev bûyer qet qebûl nedikir. Dixwest di wê katê de volqana xwe biteqîne, ewqas zivir bûbû. Lê, li hemberî zagonên xwezayê bêçare bû. Lê, Sîpan, Sîpan ê dilbirîn nema xwe girt, çavê wî bû hevalê barana ku hêjî dibarî. Rondikan xwe ji çava berdan xwar û nema sekinîn û Sîpan kire qîr;

“Evîîîn!...”

Ew deng, hemû xurtbûna dengê baranê birî û xwe gihande guhê Evîn. Hestiyên Evîn şikestibûn û xwîn bûbû doşeka wê. Nefesên dawî dida û distand. Lê, bi deng re, çavê wê giran giran vebûn û gotinên dawî ji devan derketin;

“Dizanim tu ji min hez dikî, ez jî, wisa! Lê, ez evîna piçûkim, evîna mezin ji min girîngtire.

Bi evîna mezin re bibe yek!... ”

Ew gotinên dawî, bûne gotinên xatir xwestinê!

*Riya serkeftinê berdewama hêviyê ye.*

## Hêviya Dîtinê

### 1

“Fermandarê min, fermandarê min va şopek li vir heye. ”

“Şopa çi kuro?”

“Şopa xwînê fermandarê min”

“Şopa xwînê?”

“Belê fermandarê min”

“Nexwe hin ji wan birîndar bûne. Gelo yê çend bin? Başe, lêgerîna xwe bibal berdewam bikin”

“Lê, fermandarê min dibê êvar”

“Çi? Bibe êvar, bibe şev ne giring e, ez lêgerînê dixwazim. Li gorî agahiyên gihayîn me. Koma terorîstan ne mezin e û ev der ne ciyê wane, tenê di vir re derbas bûne. Hûn hewl bidin şopa xwînê winda nekin”

Dilê wê lêdixist û ew dengên dihatin guha, dibûn gobal û li dilê wê dixistin û dil xwe di singê de hildiavêt. Pir ditirsî û ji xwe re digot;

“Divê ez nekevim dest, pêwiste li riya felatê bigerim û xwe dûrî vir bikim. ”

Birîna wê hêj germ bû. Du gule li lingê wê yê çepê ketibûn. Gava birîndar dibe, ciyê birînê bi şûtika xwe girê dide û xwe dighînê ber zinarekî. Lê, di nava çembera leşker de dîl mabû û dixwest zû xwe ji xeleka mirinê xilas bike. carekê çavê wê li daristanê ket, lê, daristan hinekî dûr bû. Lingê rastê ber xwe ve kişand û got;

“Bila şev were, bi şevê re ez ê xwe bighînim daristanê. Daristan yê min rizgar bike. Lê, nizanim çima şev nayê, ma şev jî bûye neyar!? Çima wisa dem dereng dimeşe? Divê şev were.”

Li ber zinar xwe kir piçek, xwe gihande hev û bêdeng bû. Piştçente û çeka xwe winda kiribû, tenê narîncokek pê re mabû û ev narîncok bûbû jiyana wê. Lê, tirs û dilwêrekî bûbûn hestên wê. Dengekî nimiz dibû leşkerek li ber û divinciniqî. Û digot;

“Ev bû 7 sal ez gêrîla, bûme şahida pevçûn û şeran û ez bixwe tevlî gelek livbaziyên leşkerî bûm, lê, weke niha qet netirsiyan! Her dengekek dibe leşkerek û êrîşî min dike. Lê, hêvî, bila hêvî nemre, bila hêviya min hebe...”

Bû êvar û şev ê xwe gihande êvarê, bûbû şev, lê, hîvê perda reş ronî dikir û tevgerek piçûk dibin roniya hîvê de, xwiyadikir. Stêrk jî diçirisîn, ronahî dibarandin. Û dengê çirçirkan dîsa ew ji gera xewê şiyar dikir. Her cara çav diketin ser hev, ew deng dibûn derzî û di laşê wê re diçûn. Niha jî, nema xewa wê dihat, xewê barkiribû, revî bû ...Lewre, birînên wê cemidî bûn û lê dibûn axîn û nalîn. Pir tî bûbû, lêvên wê bûbûn axeke qelişî û tim li benda avê. Li dora xwe nerî, her der bêdeng bû, êdî dengê çirçirkan jî nedihat. Xwest lingê bûyî hedef ji gulan re rast bike. Birastkirinê re janek kûr kişand, ji şewata birînan hemû deverên wê bûne kozên êgir û dil bû sêlek sor! Hêstir bûne êş, çav bûne kaniya êşan û rondik bûne hevalên bêçaretiyê!

Di nav lerzîna lêvan de got;

“Hêvî! ... Lê, gava hatim girtin, gelo ez ê karibim li berxwe bidim? Yan ez ê bibim radestkar û ciyên hevalên xwe yê ku me roj, meh û salên dagirtî, xweşî, şîranî, şadî; tehlî, şorî û nexweşî bi hev re bo evînê barandî, nîşan bidim? Na, ew min bikin qet, mîna çawa leşkerên Sedam di canê Leyla Qasim de bêrîk çêkirin û dagirtin xwê, wisa li min bikin jî, ez radestiyê napejrînim! Ne ev,

ez nahêlim min zindî bigrin!”

Sekinî, gotin sekinîn, ew jî bê deng bû mîna bêdengiya şevê. Piştî qederekî, mejîafirandina bêjeyan kete tevgerê û got:

“Çima wisa ye? Ev bû çend demhêjmar li benda hatina şevê me, lê, vaye bû şev, lê, şevekî bi roj. Hîvê jî, xwe kiriye roj û li hemberî min kemîn vedaye! Lê, divê ez bigihîjim daristanê.”

Li ser zik dirêj bû, ew û erd, zixur, kevir û qetên darên biçûk û strî bûne yek. Xwe dimeşand, bizorê dimeşî û her qederek meş dibû lêdan û canê wê dikir îsyan, dikir axîn, dikir qîr û hawar! Strî û sixur di birînên wê re diçûn û firmêsk dibûn şahidê wê lêdana rê. Gava giha daristanê, li pêşiyê cihokekî avê xuya kir. Xwest êrîş bike avê û vê ava diherike daqûrtîne, lê got;

“Xwedê, av, pêdiviya mirovan a rojene, bû ye penceşêr! Ez çi bikim? Dixwazim avê vexwim. Lê mirin? Hevalan gotibû ‘gava mirov nû birîndar dibe, divê mirov avê venexwe, ji ber ku xeter e.’ ez jî naxwazim bimirim! Lê çi bikim, canê min avê dixwaze. Bila be, ez avê venaxwin, bila ez bitebat bim.”

Bi kulma av bi çavên xwe dakir, dû re serê xwe kire nava avê. Zû serê xwe derxist, li paş xwe nihêrî. Tiştek nedît û berê xwe da daristanê. Birînên wê dişewitîn, pir caran dikir ax û nalîn! Lê, çare nebû, diviyabû xwe bigihîne daristanê û rê, armanc û dem lê dirêj dibûn. Lê, piştî hewldanên gewre dervasî nava daristana asê bû. pişta xwe da darekî. Li birînên xwe mêze kir; şûtika wê ya li ser birînan girêdabû, ji xwînê sor bûbû. Çavên xwe girt. Çû rojên berê, jiyana derbasbûyî li ber çavên xwe dubare kir û ji xwe re got:

“Stenbol çi bajarekî xweş bû û gera li wî bajarê hê xweştir bû. cara bavê min ez digerandim, dibirim ber deryayê û dû re ez dibirim aşxanê. Hingê me bi hev re masî dixwarin... Jiyana min gelekî xweş bû, em dewlemend bûn. Diya min û bavê min odeyekî pir xweş ji bo min xemilandibû. Tiştek ji min kêm nebû. Rojên betlanê ez heta nîvro di xew de dimam. Min pir ji xwendinê hez dikir, lê gava mamê min ez kirim şoreşger her tiştê min hat guhertin...”

çavên xwe vekir, bi herdu destan serê xwe girt û got:

“Gelo ez poşman dibim? Ev jiyan li min tahl tê? Rastiya min a veşartî û xwe neguhertî diaxife? Na, ez ne poşman im. nexwe çima ez wisa xeyal dikim? Na, vîn, Serokatî, şehîd û evîn man li kû? Evîn, erê evîn, evîna kevotê!... Hat bîra min mamê min çêl evîna kevotê kiribû gote min; ‘Hêvî na, pêwîste êdî ez bêjim hevala Hêvî, ji ber ku tu bûyî şoreşger. Berî ku em xatir ji hev bixwazin, dixwazim ji te re çêl evîna kevotê bikim. Kevot bi qasî kevokê mezin e. Rengê xwe yê axê ye. Cara kêfa xwe hebe dixweyîne. Bi tenê tu carî najîn. Tim cot cot bi hev re dijîn. Hêlîna xwe li cihên bilind çêdikin. Gava hêlînê çêdikin, pir bi baldarî çêdikin da hêkên wan nekevin. Di meha Gulanê de du hêkan dikin û di havînê de çêlîk ji hêkan derdikevin. Di dema hêkê de yê nêr diçe nêçîrê. Gava hêk dibin çêlîk herdu diçin nêçîrê. Ew kedî dibin, fêrî mirovan dibin. Lê, xisleta wan ya herî girîng ew e ku cot bê bê hev nabin, bê hev nikarin bijîn. Ger yek bimire, ya din jî dimire. Pir ji hev hez dikin û pir evîndara hev in. Ango, hevala Hêvî pêwîste em jî wekî wan bibin evîndara axê Û jiyanê. Bila xewnên me li ser welat bin.’ Gotinên mamê min rast in. Di rojên teng û çetîn de evîn û rastiya evînê di kesatiyê însan de xuya dike. Di vê ez bibim kevot û bi axê re bibim yek. Lê birînên min kevin dibin, hêdî hêdî kurim dikevine wan...”

Pişta wê li dara mazî û çav ketin xewa demhêjmaran. Êdî nikaribû li hemberî xewê li ber xwe bide...

Daristan mîna şikeftekî tarî lê hatibû. Piraniya daran li cem hev, nêzî hev dirêj bûbûn û niha çiqil û pel çiqilên wan di nava hev de bûn. Hingê bi hev ve bûbûn yek, ronahiya stêrk û hîvê nikaribû xwe berdin cîhana tariyê. Ev der bûbû cîhanek bi serê xwe û navê xwe "cîhana tarî" bû. çav çavan nedidît, her çiqas çavên hin lawiran zer dikir di kûrahiya tariyê de, lê qet li beramberî tariya tirsafirînar ne tiştek bû. Dengê kundan jî melûl melûl derdiket. Lê; gur, rovî, keftar û lawirên şevhez dûvikên xwe dihejandin û li nêçîra xwe digeriyan. Lê, Hêvî tevî nalîn, axîn û birçîbûnê bûbû hevala xewê. Ji meş û şerê hundirê xwe, bê hal ketibû. Êdî Hêvî li ber birîn, werma birînên xwe nediket, lê pir li ber dudiliya di nava hestên wê de isyan kirî, diket. Ji ber ku xwe ji her mercan re amade didît, lê niha ketibû ser rêya dudiliyê. Berî çavên xwe radestî xewê bike, du firmês ji çavan gindirîbûn û du gotin ji gewriya zûha, ji nava lêvan tevlî bêdengiya şevê bûbûn:

"Serokê min, lêborîna xwe dixwazim, da dawî li ser vê riya azad amade me!"

Ketibû xewa giran û qet pejna derûdora xwe nedikir. Da ku rojê li dijî şevê şer diyar kir. Roj û şev li ser qada xwezayê ketin nav pevçûn û şerekî dijwar... Û roj bi ser ket, şev têk çû. Çend tîrêjên xwe di nava pelçiqilkan de avêt ser rûçikên Hêvî. Li ser kevîk û demên wê du xetên zirav xuya dikirin. Ew şopa giriyê bû. xuyabû di xew de pir giriyabû. Gava tîrêjan wênaya jan xêz kirî alîst, di nav nalîn û axînek deng nizim de çavên xwe vekir. Bi vekirina çav de dengê bivir di gohan de olan da. Li derdora xwe nihêrî, lê kes nedît. Li dûr nihêrî; di nava daran de gundiyek dar dişkandin xuya kir. Ev du roj bûn lêvên ken nedîtiye, bi dîtina gundî re kenî û ji xwe re got:

"Ez zû xwe bigihînim wî zilamî, agahiyan jê bigirm û alîkariyê jê bixwazim, lê!? Ev zilam ne cerdevan be? Min nede destên neyar? Lê wekî din tu çara min nîn e..." Bi kedeke bêhemapa xwe ber ve zilam de xişikand. Dema giha nêzîkê wî bi dengekî bilind kir gazî:

"Mamo... Mamo..."

Bi deng re Mamê Hesen veciniqî û got:

"Bismila, bismila, nalet li çavên şeytan were!..."

Apê Hesen lipaş xwe nihêrî; kefiyek sor li serê wî girêdayî bû, êlekek perpitî li ser gomlek(qemîs) berzik kirêt lê... Riya wi ya reşspî bostek dirêj, simbêl ji dûmana cixarê zer bûbû. Li ser qermîçokên eniya wî ket û ezmûna 60 salan xuya dikir. Her xetxetokek destê wî jî zimanê hilberîna jiyanê bû. Apê Hesen babê du şehîdan bû û mal û can kiribû gorî dozî!... Dîsa wê rojê ji bo çend darekê bibe mal, berê xwe dabû daristanê... Li Hêvî nihêrî, bi lez ber ve hat, got:

"Ev çi rewşe keça min?"

"Mamo ez gerîla me."

Mamo: "Ez te dibînim, ji her aliyê te ve xuya dike ku tu gerîla ye."

"Ez birîndar im!"

"Keça min, qet metirse û derdan nexwe, tu hatî navnîşaneke rast. Gundê me nêzîkî vir e, ezê rabim herim gund gazî kurê xwe bikim da em te bibin gund."

"Mamo, rewşa gund çi ye?"

"Keça min, gundê me tev de welatparêz in. Qet şik û gumanan neke, tuyê dîsa bigihîjî hevalên xwe."

Êdî dilê Hêvî ne ji tirsan, ji şahiya gotina tu yê dîsa bigihîjî hevalan re lê dixist. Heta Apê Hesen û kurê xwe hatin Hêvî bi xewna dîtina hevalan re jiyan kir. Çawa Apê Hesen û kurê xwe hatin, Hêvî rakirin gund...

## 3

Pîreka Apê Hesen tevî keça xwe ya mezin bi fermanên Apê Hesen birînên Hêvî şûştin. Dermanê xwezayî û giya danîn ser û pêçan. Apê Hesen li cem hevala Hêvî rûnişt û got:

"Berî du rojan dengê pevçûnê giha gundê me. Me zanîbû şer di navbera hevalan û neyar de rû daye. Dûre neyar hate gundê me, lê hemû lêgerîn û tevdana wan vala derket. Niha gund di ewlebûnê de ye, tiştekî awarte nîn e, lê, keça min hûn çawa birîndar bûn?"

"Em desteyek bi navê "Destya Zîlan" ku tev ji hevalên jin pêk hatibû, ji herêma Botan me da rê da ku em xwe bigihînin herêma Serhedê. Li vir hin plan û armancanên me hebûn. Meyê derbasî jiyana kiribana. Lê, mixabin piştî meşa rojan desteya me kete kemîna neyar. Pevçûn li dora sê katjimêran berdewam kir. Ez ji lingê xwe birîndar bûm. Hevalên me yên din çeper qetandin, lê ez di nava çepera neyar de mam. Min gelekî tundî û êş jiyan kir da giham daristanê... Lê, niha zû dixwazim têkiliyê bi hevalan re girê bidim."

"Bizane tu gihayî hevalan. Keça min, mala Apê Hesen mala gerîla ye. Apê Hesen babê du şehîdan e. di demekî kûrt de tê hevalan bibînî..."

Axaftin bû werîs û dirêj dibû. Rûpelên ku demekî derbasbûyî û qet xwe nevekiribûn, yek bi yek vedibûn da şevê li derî xist. Malbata Apê Hesen di nav xweşî, ken û xemgîniyê de berê xwe dane cihrazanên xwe. Hêvî û cîhana di kuleka odê re xuya dikir, man bi tenê. Kulek jê re bû dûrbîn û asîmanên rengderya tev stêrkên geş agir li ser qada asîmanên sayî xweş didît. Di nav wê dîmenê de aramiyek bi nexşê stêrkan xuya dikir. Lewre, Hêvî, rûçikên wê di nav perwaza hêviyê de dikeniya û ji xwe re digot:

"Wekî Serok gotî; 'dibistana mezin jiyan e" ez di pola yekemîn ya vê dibistanê re derbas bûm û min çend rûpel jê xwendin. Lewma hinekî dikarim bikenim..."

Roja din êvarê çar gerîla derbasî mala Apê Hesen bûn. Çawa çavên Hêvî bi wan ket, firmêskên şahiyên xwe ji çavkaniya wê berdan xwar û bi silavê re hevalên xwe hembêz kirin!...

***AWAZA EVÎNÊ***
*Bilbila evînê,*
*Hest bûne fîgan*
*Li cîhana te,*
*Her fîganek*
*Bû stêrkek*
*Li asîmanên me,*
*Her pêtek ji agirê te*
*Bû awaza evîna me!...*

**Awaza Evînê**

Gelo tê bîra te hevala min a çav reş, bejin zirav û xwedî pora rengê şevê ew roja ku nayê jibîrkirin? Wê roja ber ve êvarê ku dengê barana dîn û har ku dîwar, şibake û deriyên zindanê derbaz dikir û li cihê hevdîtinê dibû hevalê dengê hevalan. Hêdî hêdî di navbera têl û hesinên

pencera dîtinê de rûwê te yê bilyan xuya kir. Wê hingê jî, hîn hevala Sema û hevalê Fikrî xatir ji me nexwestibûn û neçûbûn civaka stêrkan. Lê, wê rojê hevala Sema nehatibû, lewra piştî te silavek li gorî wê kesatiya xwe ya bilyan û germ da, min pirs kir:

“Heval, ma çima hevala Sema nehatiyte?”

Bi pirsê re, coşekî di herdu çavên te de da der û kenek şêrîn xwe ji herdu lêvên te berda xwar, tevlî gotûbêja ku qet min nedixwest biqede bû û te bi wî kena xwe got:

“Niha ka bêje min, ev çima wisa dengê hevalan bilind e?”

“Dibe ku ji bona baş dengê hev bibihîsin be!

“Heval binêre ez û te jî diaxifin, lê dengê me nizim e. Pêdivî bi dengê bilind nîn e, de qene ku heval hemû têbigihîjin ka çi ji hev re dibêjin. Ji bona nehatina hevala Sema jî, do civîna me ya mehê hebû, ew bi xwe komîsyon bû. Êvarê jî heta derengê şevê bi nivîsekî re mijûl ma û îro bûbû aşpêj. Lê birastî jî xwarineke pir xweş çêkiribû. Heta Pir hevalan digot ‘ev cara ewil e ku em xwarineke ewqas xweş dixwin.’ Lê, wekî ku tu jî dizanî heval nexweş e. Êdî bêşiyan ma û nema dikare were.”

Piştre kêliyek bêdengî çêbû. Tenê dengê baranê û hevalan dihat. Lê, te lênûska l ber xwe vekir û bi pirsekî bêdengiya xw şikand:

“Ez dixwazim bilbil, şelûl û kew nas bikim û ji bona naskirina wan ji min re hate gotin ku hûn dikarin çêl jiyana wan bikin?”

Li ser vê pirsa te ez şaş mam û bi nêrîneke matmayî çavên min kete çavên te yên ku razek diveşart. Lê min kir û nekir tênegihiştim ka ew raz çi ye! Vê rewşa min bala te kişand, ji ber vê dîsa te got:

“Çima zîq li min dinihêrî? Ez li benda bersivê me.”

bi gotina te çavên min miç bûn, serê min aket xwarê. Bi rastî jî ez di nava şermê de mam. Tu jî têgihiştî, zimanê min bi wê gotina te hate qefilkirin, lewma te got:

“Wisa nabe hevalê min, ev bîsteke tu bêdengî. Bila gotin nebin berkêşê pişta me! em heval in!...”

Hingê min xwest rastiya derûniya ez girtim biguherînim û ketim ser rêya xweparastinê:

“Na heval, gotinên te di cih de ne, lê min xwest jiyana wan lawirên ku te pirsî bînim bîra xwe. Lê, gelo çima ev hersê lawir?”

“Ev bûn çend meh ku ev lawir tim dibin mêvanê xewnên min. Çawa çavên min dikevin ser hev, yek ji Van lawiran li ber gohên min dide ber awazan. Ez jî radibim û li ser cihê razanê rudinêm, gohdarî dikim û bi gotina ‘rojbaş’ re ji xewnê hişyar dibim.”

“Baş e, dixwazim bilbil bînim ziman. Bilbil pir biçûk e. bilbilên giya û yên daristanan hene. Yên li daristanan wekî çûkan dijîn. Her tim nakin fîgan, demên xwe yên fîgankirinê hene. Bi piranî di biharê de, sibê, êvar û di çaxê ku heyva çardeşevî bilind dibe jor dikin fîge fîg. Bi awazên xwe re li cihê xwe nasekinin, her û her di tevgerê de ne. Carina jî, rêz didin hev. Ev cureyê bilbil, rengê xwe wekî xweliya cixarê ye. yên di nava giyan de dijîn, rengên xwe sor û spî, sor û reş, zer û spî ne. Ev zêde nakin fîgan, di dema baranê de tên cem hev û dikin fîgan. Bi gelempêrî bilbil hêlîna xwe ji mûyên pez çêdike. Lê, bilbilên zinaran cuda ne. Ew her tim dengên cihê cihê dertînin. Rengên xwe wekî rengê kevirên ku li ser dimînin e. bilbilên zinaran ji yên din mezintir in. Hêlîna xwe li dûrî avê û bi hiriyê çêdikin û gava dest bi çêkirina hêlînê dikin, hinek mû dixin nava hiriyê. Ew hêlîna wan heta mirinê dimîne û dûre derbasî çêlîkên xwe dikin.ew tu caran hêlîna xwe kirêt nakin. Lê xisleta bilbilan ya diyar, ji gulê pir hez dikin.”

“Lê şalûl?

“Şalûl piranî zer û şîn e. Li dora gundan, di nava zezî, şîlan û diriyan de jiyan dikin. Dengê xwe wekî yê bilbilan xweş e, lê weke dengê wan ne bilind e. Her tim nakin fîgan. Berdestê sibehê ku roj dihilte, dixweyînin û gava dengek diçe wan bersiv didin. Sê hêkan dikin. Biharan hêkan dikin û havînan çêlik dertên. Hêlênên xwe li ser dara sêv, hirmî û şîlanê çêdikin...”

“Em hatin cem kew û jiyana kewan!”

“Belê heval, kew û jiayan kew... Dengê xwe pir xweş e. Nikil û lingê xwe sor e û bîrûyê xwe stûr e. Bi piranî sibehan dixweyînin û êvaran jî ji bona ku bên cem hev dixweyînin. Bi dengan re jî dixweyînin. Di meha gûlanê de şanzdeh hêkan dikin û di meha tirmehê de çêlîkên xwe dertînin. Hêlîna xwe bi dizî û veşartî di nava giyayê de çêdikin. Bi piranî li cihên giya ne. Di zivistanan de jî li cihên ku berf xwe lê nagire disekinin. di zivistanan de keviran dixwin. Serê xwe bi axê dişon.

Lê di biharan de kulî û keskahiyê dixin. Kom bi kom diçin ser avê. Kewa mê hêlîna xwe bi dizî çêdike da ku yê nêr wê nebîne. Ger hêlîna wê biheje, li wê derê namîne. Zû kedî dibe. Lê, xisleta xwe ya nexweş dijminê qewmê xwe ye...”

Gava ez sekinîm tu têgihiştî ku min jiyana wan qedand û te bi coş got:

“Hindik ma heval, ez jî bibim bilbil, şalûl û kew... ezê zevî bi zevî, daristan bi daristan, çiyan bi çiyan, çem bi çem bigerim, bibînim û bi çiyayên azdiyê re bibim yek. Birastî ev xewna min e. Pir caran li cem hevala Sema rudinêm û bi saetan ji min re qala jiyana gerîla û xweşikahiya welat dike. Ez giham wê baweriyê ku divê her yek ji me bibe bilbil, şalûl û çivîkên xwedî awazên xweş da ku em karibin gel li dora xeta Serok APO kom bikin.”

“Lê, çima çima em nabin xwediyê şêwaza APOCÎTİYÊ?”

“Lewra, giyan û hestên me dûrî yê Serok in. Me hîn jî evîn, evîna rasteqîne di dil û mêjiyên xwe de neafirandiye. Cîhana hêvî, xewn û xeyalên me biçûk e, em bi ziyana xwe ya ezperestiyê ve mijûl dibin, lewma jî em nikarin bibin wekî bilbil, şalûl û kew balkêş û hezkirina xwe di dilan de ava nakin. Di vegerê dîsa ezê bihevala Sema re li ser vê mijarê gotûbêj bikim.”

Dû re, piştî demek derbas bû te xatir ji me xwest û got:

“Hevalnô! Ez diçim, dibim bilbila welatê xwe. Ez baweriya we hildigirim, daxwaz û armancên we bi xwe re dibim. Soz didim ku ezê wana li serê çiyan bidim jiyankirin. Ezê hemû şiyan, vojen û vîna xwe bi xeta Serok APO re bikim yek!...”

Û tu çûyî... Te navê xwe kir Berîtan li welatê dûr...

Te xwest ku xwe bikî Berîtan, Berîtana navê têkoşîn û berxwedanê! Tu tim di jiyanê de beziyay da ku biafirînî. Lê, Sema bû hevala te û te jî agirê wê ji bona xwe kire neynik da ku xwe bibînî. Û gava ku yên li dijî agir serê xwe rakirin te got; “dê tu caran ev agir venemire, dê tim geş be û te kir qîr, az jî xwe dikim goga agir li hemberî kesayetên li dijî xetê!...”

Û agirê evîna te, li welatê biyan bû şewq, şewqa stêrkên geş agir ku tim dil û mêjiyên me ronî dike. Aha, vaye, hîn jî agirê te geş e û pêtên te me germ dike!

*Ji bona bîranîna Hevala Hukmiye SEYHAN (Berîtan) ku li Rusyayê li dijî kesayetên li dijî xetê agir berda bedena xwe.*

*Meşa li ser sêlasor a jiyanê di hemêza buhiştê de ew e evîna resen!...*

## Evîna Min

### 1

Temenê min deh salî bû. Ez, du xwişk, birakî û dê û babê xwe li gundekî li dora sed gazî li dûrî Çemê Ferad, diyan dikir. Ez, xwişk û birayê xwe li vî gundê ku di biharan de, ji keskahî û di

meha Tirmehê de ji fêkî xua nedikir, hatin dinê. Gundê me pir xweş bû. Di demsala havînê de hemû cureyên fêkî û şînkahî xwe pêşkêşî gundiyan dikir. Kaniyek jî li qada gund bû. Lê, ava wê çi av bû? Gava mirov vedixwar, ji sarbûna wê diran li hev diketin û ji daristana gund dengê teyr û çivîkan kêm nedibû. Em jî, malbata me wek xweşiya gund bextewar bû. Du çêlek, deh mî û nêzî panzdeh bizinên me hebûn. Bavê min ew radestê şivanê gund kiribûn. Tu carî nedixwest ez şivantiyê bikim. Ew bi xwe jî qeçaxçî bû. di navbera binxet û serxetê de qeçaxcîtî dikir... Lê, rojekî bi bazdan min ji mala mamê xwe berê xwe da mal. Hewşa me ji gundiyan hatibû dagirtin û dengê giriyê ji adeyên me bilind dibû. Min di cih de, xwe avête hundirê odê. Dayîka min pora xwe dikişand, bi kulman li singa xwe dixist. Gava çavên wê bi min ket, bi girî re got:

“Were Gulê, were sêwiyê, bê kes û bextreşê! Em ban bê xwedî û bûn pepûk!...”

Min xwe avête hembêza dayîka xwe, firmêsk ji çavên min diherikîn, lê hîn jî min nizanibû çi rû daye. Dayê, pora min bi destênx we şeh dikir û ez ber bi pêsîra xwe ve dikişandim û pê re pê re digot:

“Keçika min, tu mayî bê bav, bavê te bi destê leşkerên Tirkan hate kuştin!...”

Hê gotinên dayîka min bi dawî nebûbûn, min xwe avête oda din. li wir cendekê bavê min li ser doşekê bû, lihêv bi ser laşê wî de bû. Ez li ber serê wî rûniştim. Min pir pir rûyê wî, dest ûeniya wî maçî kir û ez digiriyam, digiriyam... Da jinpîrek hat û ez ji wê odê derxistim. Dû re min bûyera kuştina bavê xwe ji serî heya dawî bihîst. Wê şevê, bavê min û çend hevalên xwe tevî hêstiran dixwazin ji binxetê dervasî serxetê bibin. Têlê dibirn û tên vî alî. Şev jî ne şev e. Her dever di bin roniya heyvê de xuya dikir. Leşkerên sînar wan dibînin. Leşker wan gulebaran dikin û di navbera wan de pevçûn destpêdike. Bavê min serê werîsa hêstiran dide hevalekî xwe û li paş bi leşkeran re şer dike, lê piştî birîndarbûna çend caran li sînor vê carê bavê min tê kuştin. hevalên babê min jî cendekê wî li wir nahêlin û tevî barê wî ew tînin gund. Li gund jî di nava xwe de hinek dirav didin hev û didin dayîka min. Êdî ji wê rojê şûn de jiyana me serobino bû, hat guhertin û tiştek nema mîna berê!...

## 2

Min gotibû piştî kuştina babê min jiyana me hate guhertin. Di nava malbatê de ya mezin ez bûm. Xwişk û birayên min biçûk bûn. Her çendî car carina mamê min dihate cem jî, lê ew bi xwe jî xizan bû û tenê dikariya malbata xwe bide jiyankirin. Lê, dîsa çi ji destê wî bihata, texsîr nedikir. Lê, min biryar girt ku ez şivantiya mala xwe bikim. Êdî ez bûbûm şivan. Her sibeh min, mî û bizin û herdu çêlekan dida pêşiya xwe û bi êvarê re vedigeriyam malê. Lê, rojekî mihekî min winda bû û ez bi xwe jî gelekî dûrî gund ketibûm. Li miha windabûyî digeriyam... Ez giham nêzî cihekî tev lat û zinar û li derûdora xwe giyayên kesk. Lê, ji nişkê ve ji pişt latekî zilamek derket. Bejin dirêj, simbêl boq û bi rî, kefiyek reş û spî li dora serî pêçayî, şal û şapik lê û çekek li milê wî. Jixwe berê ez ditirsiyam û dayîka min gotibû; “berxika min, xwe dûrî xortan bike, namûs fanûsa rûyê mirov e!...” Bi tirsê re gotinên dayîka min di gohên min de dikire zime zim. Min du gav pêş de avêtin. Lê, ew zilam keniya û got:

“Metirse, em ne kesên xirab in. Va hevalên keç jî bi me re hene.”

Li pişt xwe nihêrî û gazî kir:

“Hevala Besê, hevala Besê! Va mêvanekî me yê şîrîn hatiye.”

Min hew dît jinek bejin kin û por dirêj, lêv bi ken li ber çavên min da der. Û bi rûkenî gazî min kir:

“Ka were cem min hevala xweşik, were li cem me, em bi hev re xwarinê bixwin.”

Bi dîtina wê re hêdî hêdî xwîn hate canê min, hindik be jî tirsa min şikest. Lê, min gotina heval fêm nekir. hate cem min, rûyê min ramûsand û ez hembêz kirim. Bi destê min girt ez birim pişt latan. Lê çi bibînim, komek însan li ser sifra xwarinê rûniştine û di nava wan de du jinên din xuya dikirin. Gava çavên wan li min ket li dora min kom bûn, yên rûyê min maçî dikirin, ên henek bi min re dikirin. Lê, ez ji vê rewşê matmayî mabûm, carina dikenim, carina jî min zîq li çavên wan dinihêrî. Her çendî ji bo xwarinê gazî min kirin jî, ez neçûm ser sifrê. Lewre, min pir şerm dikir û min ji xwe re digot; ez xwarinê bi zilaman re naxwim. Lê, ya navê xwe Besê hin lorik û firingî danî ser nan û da min, em li cem hev rûniştin û dû re ji min re got:

“Navê mêvanê me ya xweşik çi ye?”

“Gulê!”

“Navekî pir xweş e. Gulê, tu ji kîjan gundî ye?”

“Ji gundê nêzîkî çem.”

“Ew gundê nêzîkî me?”

“Erê!”

“Ma qey tu natirsî, heta vê saeta dereng ji derve dimînî? Niha dayîk û babê te dilên xwe ne rehet nin.”

“Bavê min miriye. Ez şivantiya pezê xwe dikim. mihekî min winda bû, ez jî lê digerim.”

Çavên min tije hêsir bûbûn û min hew dît ku xwe berdan xwar. Dilê min bi min şewitî. Besê destê xwe bi ser pora min re bir û anî û hêsirên min pak kir, û got:

“Megirî Gulê, gul nagirîn. Gul şadiyê didin mirov. Emê niha miha te jî bibînin. Lê, dixwazim bêjim, divê tu ji kesekî re vê nebêjî ku min kesên çekdar dîtine. Ger dewlet pê bihese yê hemû leşkerên xwe bîne ser me, erê?”

“Erê!”

Kêliyekî ma bê deng. Dû re destê xwe bi ser stûyê min re anî û got:

“Gohdarî bike Gulê. Em gerîla ne. Em dixwazin leşkeran ji ser axa xwe derxin. Ji ber ku wan axa me ji xwe re biriye. Zarokan, jinan, kalan, bav û dayîkên me, keç û xortên me dikujin. Nehêlin zarok li gundê xwe, li nav bax û bistanên xwe bileyîzin, dewlemendiya me ji xwe re dibin. Ger em wan ji ser axa xwe neavêjin, emê tim xizan bimînin, ên zarokan sêwî bihêlin, lewre yên bavê wan bikujin û yên wek te şivantiyê bikin. Pêwîstbû, tu herî dibistanê û zana bibî, di nava jiyaneke xweş de bijî!...”

Min pêjin kir ku dilê min ber wan ve diçe. Lewre, axaftina Besê pir li xweşiya min çû. Dû re rabûn û li miha min geriyan. Piştî demekî ew dîtin, dane min û ez anîme heta nêzîkî gund...

## 3

Gava ez giham nêzî xanî, min hew dît dayîka min li ser kevirê li ber deriyê hewşê rûniştiye û serê wê di ber de ye. Dema çavên wê bi min ket, bi lez hat cem min, bi çemlê min girt û dahfî

hundirê hewşê kirin. Ez têgihiştim ku ji bo derengmayîna min dayê pir zivir bûye. Lê, heta hingê qet bi min de nekiribû qîr, lê gava min got min hin kes dîtin, dîn û har bû û got:

“Keçê! Min ji te re negotibû xwe dûrî zilaman bike? Ma qey tu dixwazî me rûreş bikî di nava gundiyan de, ha?! Tu wî bistê li ser tifikê dibînî, weleh ger carekî din tu dûrî dora gund herî û wan zilaman bibînî, ezê bi wî bistî hemû canê te dax bidim, tu zanî?”

Ez diponijîm ku min tu tawanbarî nekiriye, min tu guneh nekiriye. Wan kesan jî tu xirabî bi min nekirin, pir baş nêzî min bûn. Lê, min xwe li qorziyeke odê kire piçek û ez digiriyam. Piştî demekî dayîka min hate li cem min rûnişt û got:

“Ez qurbana keça xwe me, em mane bi tenê. Heta îro gundiyan tim bi qencî qala me kirine. Bila kes bi xirabî li ser me neaxife. Berxika min, hay ji xwe hebe.”

Rûyê min maçî kir û serê min danî ser kemaxê xwe. Di ber dilê min re diçû û dihat da min dilşad bike. Lê, têkiliyên min bi gerîla re roj bi roj pêş diket. Meh û sal bihorîn, êdî ew dervasî nava gundê me jî bûbûn. Tim dihatin mala me. dayîka min ewqas hat guhertin, ger çend rojan nehatibana gel me, dayîka min gohên min dibir, hingê pirsa wan dikir. Lê, ez tim diçûm cem wan. Êdî min jî kêm zêde zimanê jiyanê, welat û wateya axê, gotina heval û neyar nas kir. Ez têgihiştim ku çima babê min hatiye kuştin û çima em xizan in û baş têgihiştim ku çima ewqas mirov li serê wan çiyan in...

## 4

Lê xwezî min ew nûçeya dilsot nebihîstibana. Ji min re gotin “hevala Besê şehîd ketiye.” Gava min navê “şehîdbûnê” sah kir, hemû canê min tevizî û gewriya min ji giriyê hate dagirtin. Hema min bi destê xwe pêşiya çavên xwe girt. Lewre, min dizanî firmêsk ê ji çavên min biherikin. Û birastî jî wisa çêbû. ez pir giriyam. Şehadeta hevala Besê hişt ku di nava rastiya xwe de kûr noq bibim. Êdî min rûpelên mêjiyê xwe yek bi yek qulipand. Êdî di nav her gavekî min de bangewaziya çiyan hebû. Lê, ya girîng ez giham bersiva evînê. Êdî, xewn û xeyalên min hezkirina ji axê bûn; çiya, xweza, azadî û azadiya jinê bû. Hest û giyana min li pey evînê, azadkirina însan û civakê dibeziya. Azadiya min bûbû stêrk, heyv û jiyaneke wekhev. Û ez bi Serok APO ve pir hatime girêdan. Ji ber ku ez têgihiştim ku afirandina jiyaneke bedew û jinekî azad ew e. Di nava salan de, heval ez fêrî xwendin û nivîsandinê jî kiribûm. Ev yek bû alîkar ku karibim bi mêjiyek fireh li ser pirsgirêkan biponijim. Di dawî de ez gihame vê encamê ku evîn û bidestxistina evînê girêdan û yekbûna bi Serok APO re ye. Ez ji bîr nekim, pirtûkên Serok jî destên min nediketin. Min di koxê me de pirtûkxaneyek di bin erdê de çêkiribû. Lê, di dawî de min biryar girt ku tevlî refên gerîla bibim. Wê demê birayê min û xwişkên min jî mezin bûbûn û dayîka me gerîla nedida bi giyana xwe. Ango; dixwazim bêjim ku ji bo tevlîbûna min merc û kat amadebûn. Şevekê ez li cem dayîka xwe rûniştim û min ev fikir û biryar ji dayîka xwe re vegot:

“Dayê, ez dixwazim herim serê çiyan!”

“Ez tênegihiştim keça min!”

“Dixwazim tevlî gerîla bibim.”

“Wey xwedê bi te re be keça min, tu jî werqas ji hevalên jin ne çêtir î! Riya te vekirî be, hemû şêx û mişayîx bi te re bin. Şîrê berê min li te helal be, Gula dayîka xwe.”

Roja din bi şev, min xatir ji dayîk, bira û xwişkên xwe xwest û bûm şervana jiyana evînê!...

## 5

Di bin mercên herî dijwar de li ser riya meşiyam. Li serê çiyayê Cudî min stêrk dihijmartin. Li Gabarê di bin roniya heyvê de çavên min bi ramûsanên bayê hênik re diketin ser hev û bi dîlana tîrêjên rojê re li ser qada rûyê min, di nava jiyanê de dibezim da evîna pîroz min di nava kûrahiya buhişta xwe de pêşwazî bike. Û ez di nava qedir, qiymet, hezkirin û hêza afirandina wê de werim helandin. Ji bo derbasî hundirê wê bibim, li Bagok, Agirê, Sîpan, Herekol, Qendîl û gelek çiyayên din birîndar bûm, lê qet min gavek paş de neavêt. Û vaye dimeşim, bêyî ku bibim dudil, li evînê digerim, li ser xeta Zîlan û Sema dimeşim da bigirim rastiya xwe û heta dawî ezê li pey evînê bim!

*Gava tovê evînê tê avêtin*

*û tov li ser rastiya xwe şîn*

*dibe, ne hêz, sedê çînê jî,*

*nikare bibe asteng li pêş dara evînê!*

# GUSTÎLKA BİXWÎN

## 1

Zivîstan bibû çeperek û li dora xwezayê xwe pêçabû!...Baran, ba û cara bahoz li ser qada axê leyiştikek kembax li dar dixist... Û gundê seranser asîmanê xwe bûyî ewrên xwe vale dikirin, di nav tariya tirsê de winda bibû. Dîwarên mezelên gundiyan ji barîna baranê, axa xwe dihate xwar û tevlî heriyê dibû. Gund bi erjengî di nava lehiya avê de ma bû. Lê, gund radestî zagonên lehîherikandina baranê bibû!...

"Hiso! Kuro Hiso ka rabe, agir kete mala me! Ka şiyar be te xwelî li serê min kiro..."

Hiso lihêf avête aliyê çepê û bi ser jina xwe de kir qîr!

"Çi ye keçêê!? Çi bû, çi dixwaze, ma çi rûdan daye, dîsa bûye lepelepa devê te?"

"Hiso, Gulê"

"Çi bûye jê, ma Gulê çi kiriye?"

"Weleh Hiso, mala me xirabû. Bixwedê em êdî nikarin xwe naşî gundiyan bikin, em nikarin serê xwe rakin!.."

"Keçê de bibêje, te ez teqandim. De zû bibêje, lê nexwe biyezdanê dilovan ezê te bikim hevîr!"

"Ezê çi bibêjim qurban. Ez vê sibê zû ji xew şiyar bûm da havîrê nan amade bikim. Nizanim çawa çavê min li nivîna Gulê ket, di cî de qidumê min şikestin, lewre, min Gulê di nava nivînê de nedît."

"Wax wax, nexwe wisa Gulo! Te ya xwe bir serî? De başe, ger ez te li ser rûyê erdê sax bihêlim, bila navê min ne Hisoyê Elî be!"

Wekî dîna li Heso hat, rûyê wî bû xetxetokê zivirbûnê. Her du kir qîr û hawar û xwe avêt lingê wî û got;

“Ez lingê te ramûsim, ez seya te bim tu vê baranê bi tu dereve neçî. Xwe meke xwînî, em gunehin!...”

“Wir de here pîsa heram, lê weleh ezê te bikim qet. Ji xwe te ev keça bênamûs anî vê pileya nebaşiyê!”

Hiso bihêrs xwe bere xwar da... piştî demek dirêj ji lêgerîna çer erda av û herî, bi ser şopa Xelîl û Gulê ve bû...

**2**

Dinya jî, bibû êvar. Lê, ewrên giran hêjî li ciyê xwe bûn û bibûn malreşek li ser sirûştê. Her du evîndar jî, li ber devê şikeftek reş bibûn mêhvan. Gula por sor, rû ji rengê sêva zer, bejin sipîndarî û kiras û xiftan li bejnê, serê xwe danîbû ser kemaxê Xelîl û digot;

“Xelîl, çima bextê me reşe, çima felek bûye neyarê sûda me? Ma gelo evîndarî gunehe? Na, ez bawer nakim. Ez dibêjim pêwiste hemî ciwanên ji hev hez dikin, bigihin hev. Ma qey ne guneh bû Mem û Zîn negihan hev? Lê dilê min lêdixe mîna birûskên vê êvara ku naxwaze dervaz bibe. Ditirsim çarenûsa me jî, bibe wek ya Mem û Zînê!”

“Na Gula hest, dil û giyana min bikeziyên evînê girêdayî, van gotinên dilşewat mebêje. Ev bû pênc sal em ji hev hez dikin. Hezkirina me jî, cewek sipî ye!... Ma çi mafê wan li me heye, em kirin qaçax?! Ma çi têkiliyê evîna me bi nakokiyên di navbera me û her du malbatan re heye? Malbata min û malbata we du însan ji hev kuştin û bûne xwîniyên hev. Lê, ev bû deh sal ev bûyer qewimî. Lê, niha a girîng ewe ku em van demhejmarên dijwar dervaz bikin û em xwe bigihînin binxetê bajarê Qamişlo cem mala apê min. Û bawer bike Gula dirist, emê bigihin hev.”

Xelîl destê xwe dirêjî bêrika cakêt kir, destmalkek derxist. Di nava destmalkê de gustîlkek derxist û got;

“Gulê! Wê roja ha, ez çûm Mêrdînê min gustîlkek boyî te kirî da diyarî te bikim!...”

Û teqîn!... Xwîn!...Guleya ji lûleya çifta Hiso derketî, li zikê Xelîl ket. Di cî de gotinên Xelîl qutbûn. Û xwîna wî rûyê Gulê di nava xwînê de hişt. Êdî şûna baranê, dilopên xwînê diniqitîn ser rûyê Gula bextreş. Û dengê Gula bêsûd di nava reqe reqa ewran de olan da!

“Xelîîî!...”

Lê, ew jî, bi guleya duyemîn li erdê dirêj bû... Û xwîna her du evîndaran bû yek û gustîlk di nava gola xwînê de noq bû, xwe bere nava kûrahiya du dilên bixwîn!...

*Bila firmêskên zarokan biherikin ser axê, lewra axa dayê bi hestên wan xwe ji nû ve dike jiyan!*

**Firmêsk**

Befa çiyayê Kelê hêdî hêdî diheliya. Lê, gava tîrêjên rojê xwe li çiyan dixist û bi hilma xwe ya germ ew bandor dikir, berf bi lezgînî dibû av û xwe ji lêva çiya diberda xwar, tevlî rûbarê ku ji binê çiyayê Kelê diherikî dibû. Kulîlkên zozanê sorî jî, nû nû zîl didan. Ango, zozan dewlemendiya xwe derxist, ji nû ve vejîn diafirand û pêşkêşî lawirên gundiyên gundê Mijîn dikir... Êdî demsala zivistanê qediyabû û bihara rengşîrîn gav bi gav pêş de diçû. Gundiyên Mijîn jî, bi vê şoreşê, bextewar bûbûn. Lewre, baş têgihiştibûn; jiyan bihar e, bihar jiyan e û xwe xwedî dikirin. Beza di nav keskahiyê de ye...

Nalîn bi lez hinek lorik kire nav nanê tenurê û da ber gezan. Pêre pêre firek li piyala çiyê dixist. Dayîka xwe jî li ber vê dîmenê pir dilşa bû. Ji ber ku evîn, jîrîtî û hezkirina ji kar di tevgera keça xwe de didît. Di nava wan xeyalan de çavên wê bi lingê keça wê ket û got:

“Berxa min, hê destpêka biharê ye, dinya sar e, ger tu gora rîs têxî lingê xwe yê baş be. weleh tu nexweş bikevî, bavê te yê pir zivir bibe.”

Axînek kişand û di hundirê xwe de got:

“Xwedaya şev û rojan, ma te kurek ji min re kiribana sûd, ma minê bihişta ev keçik bibûna şivan? Na weleh, yê hingê bibana pişt ba min ji karên malê re.”

Nalîn li rûçikê dayîka xwe nihêrî, keniya û got:

“Dayê, qet metirse, ez bi zimanê zozanan dizanim û zozan jî min diparêzin. Bawer bike ger deh kurên te hebana, nikaribûn bi qasî min kar bikirana.”

“Wey ez qurbanê, wey dara mala dayîka xwe. Ez dizanim keça min, weleh dizanim tu bi deh xortî ye!...”

Nalîn tûrik avête milê xwe, gopalê xwe yê biçûk kire destê xwe, pez da pêş û berê xwe da zozana sorî... Dema giha zozan di cih de rûyê wê vebû û got:

“Dilê min, xweşiya min, ger ez dûrî te bikevim, bizane yê her tişt li ber çavên min reş bibe. Ez ji te û bedewbûna te pir hez dikim. tu her şev dibe mêvanê xewna min û ez di nava xweş xewnên te de dibim stêrkek.”

Li qada zozan bi kêf pezê xwe diçêrand, lê pir caran ew û beranê dûvsor digirtin pevçûnê. Wê rojê dîsa têr têr bi beran re henek kir. Dû re tev xwêdana demhêjmaran, çû li cem tûrikê dayîka wê jê re kiribû neqişe neqişî rûnişt. Lorik û du serî pîvaz danî ber xwe, lê hêj pariyê ewil di zengelorka wê de neçûbû xwar, bi dengê gulleyan re veciniqî! Hema bi lez da xwe, pez li hev kom kir û berê xwe da gund. Gava giha gund, çi bibîne; gund ji leşkeran hatiye dagirtin. Qîje wîja zarokan, hawara dayîkan dilan dike parçe parçe! Di wê navê re çavên leşkerekî bi Nalîn ket, hat bi gohê wê girt û kişand. Nalîna donzdeh salî di nava destê tawanbar de ji tirsan dilerizî. Leşker digot:

“Keça bênamûsan! Hey keça bêjiyan, tu ji kû têyî û li kû bûyî?”

Nalîn mîna di nava qeşayê de be hingî dilerizî. Lêv dilerizîn û diran li hev diketin. Canê biçûk ji serê tiliyên ling da serê wê direhilî. Li ber çavên wê, berî demekî çend gerîlayên keç ku ji aliyê leşker ve poz û gohên wan hatin jêkirin zindî bû. Tirs bû bezek û li ser dilê nazik siwar bû û dilê wê lê dixist. Leşker carek din bi ser de kire qîr:

“Pîsa heram, biaxife.”

“Eee, e, ez ji zoz, zo, zozan têm.”

“Te li zozan çi dikir, ha?”

“Mi, mii, min pez bir, biribû çêre.”

“Ma qey tu nizanî çûyîna zozanan qedexeye, ha?”

Leşker ew avêt erdê û lê xist. Gih pêl zika dikir, gih jî pêl serê wê dikir. Nalîn jî, dikir hawar!

“Dayêêê, bavooo, werin min xilas bikin, ez mirim!...”

Lê, leşker lêdan berdewam dikir da xwîn ji dev û pozên wê diherikî... Nalîn bi hewldanên sift xwe ji nav destan xilas kir û berê xwe da mal. Ew dibeziya, diket û tik tika dilê wê dibû asteng li pêşiya wê. Diket Û radibû. Çawa giha ber derî, çeka MG-3 li ber çavan zindî bû. Hew dît ku leşkerekî berê çekê dayê. Hema bi lez şûn de revî. Ne ew tenê direvî, geremolek da bû pey hev. Hin ji wan pêxas, bê kinc û hin jî di nava xwînê de mabûn!... Vê carê Nalîn li ber bavê xwe li ser dev û rûyê xwe ket. bavê wê ew rakir û hembêz kir û got:

“Keça min, Nalîna min! Ev çima her devera te bi xwîn e?”

“Bavo, leşkerekî li min xist, ewqas li min xist min got qey ez kuştim.”

“Dê roja wan jî bê. Niha baş gohên xwe bide min; here mal, boxçeya kincan bîne û zû were.Va diya te jî, nêzîkî vir in, erê?”

“Bila bavo!”

Nalîn di nava dûmana agir û bêhna şewata çekan de winda bû. di demek pir kin de erka bavê xwe anî cih û zîvirî cem bavê xwe. Bavê wê bi destê wê girt. Tev malbata xwe bi çiyayê Kêlê ve hilkişiyan. Dewletê gundek din jî bi hinceta dibin alîkar ji hevalan re tune kir. Ev gotin li ser rûyê bavê Nalînê hatibû nivîsandin. Gava gihan serê çiyê, Nalîn li gundê xwe nihêrê. Lê dinihêrî û firmês ji çavan diherikî. Firmêskên xatirxwestinê li ser dêmên narîn re dihatin xwar û gund, dar, kanî, rûbar, pez, zozan, şerê wê û beranê dûvsor û dara tûyê di nava firmêskên wê de zindî dibûn!..